



Arman

Danerê rojnameya pêşî ya Kurdî
Miqdad Mîhed Bedîrxan

Hejmar, No: 158

Gulan-Hezîran

May-June

Buha-Price 20 SKR 4 DM

Li Amedê Operasyon



Di 16'ê Gulanê de li bajarê Diyarbekirê, polis û "hêzên taybetî" yên dewletê di eynî seatê de avêtin ser 25 malên berpirsiyar û endamên Navenda Organîzasyonê Çand û Huner a Medya (MED-KOM), Partiya Gel a Demokrasî (HADEP) û Komeleya Mafê Mirovan. Di vê operasyonê de berpirsiyara MED-KOM'ê Mesûr Barzanî, Mesûre Avcu û cigirê wê İrfan Çilgin û endamên wan; Faîz Eşin, Ahmet Bartan, Hanefî Turan, Azad Turan, Huseyin Avcu, Şahabettin Alp, Halil Çager, Azîz Karakaş, Nedîm Arslan, Şîrîn Agatekin, Samet Polat, Mesûde Bayram, Huseyin Başol, Şadan Başol, Çetin Başol û Muzaffer Başar hatin girtin. Berpirsiyarê malî yê HADEP'ê yê Diyarbekirê A. Kadir Çager jî di vê operasyonê de hatiye girtin. Û gelek endamên wan jî ber ku wê şevê li malên xwe nebûn, nehatine girtin. Polis li ber awayiyên wan kesên ku lê digere, qereqol danîye.

Li Stenbolê jî polis avêt ser malên xebatkarên rojnameya Medya Guneşî. Xebatkarên wê Mehmet Sanri, Zelal Boga, berpirsiyarê kevî yê Medya Guneşî Salih Bal û xanima wî Melek Bal girtin. Bi navê Rifat Yuksekkaya kesekî din jî di vê operasyonê de hatiye girtin.

Li gor agahdariyên ku ketine destên me ev kesên ku li Diyarbekirê û Stenbolê hatine girtin bi endametiya YEKBÜN'ê tînin îthamkirin.

Li gor agahdariyên ku ji Diyarbekirê û Stenbolê ketine destê me polis û hêzên taybetî yên dewletê îşkence bi kesên girtî kirine û di vê operasyonê de gelek zerarên maddî jî daye mal û malbatên kesên ku hatine girtin.

MED-KOM di dawiya Sibate de bi beşdariyê fireh li Diyarbekirê vebûbû û di warê folklor, muzîk, tiyatro û hwd de komîte ava kiribûn û qursên zimanê Kurdî li dar xistibû.

Kesên ku li Diyarbekirê hatin girtin mahkema wan di 12'ê Hezîranê de çêbû. Ji wan 11 kes hatin tewqîfkirin. Ev kes ev in:

A. Kadir Çager, Nurullah Çager, İrfan Çilgin, Azîz Karakaş, Enver Gunduz, Mahmut Mert, Ahmet Bartan, Ahmet Keçer, S. Sanli Kutluay, Şahabettin Alp û Şîrîn Agatekin.

Dewlet bi vê operasyonê careke din da xwîya kirin bi xebatên resmî ku bi îcazaten wê jî tînin kirin tehamul nake. □

Kurdistanana Başûr ber bi aştiyê ve?

Piştî bidawîhatina mohleta agirbestinê ya ku di 4'ê Hezîranê de tamam bû, nuha jî herdu aliyên şerî, PDK û YNKê cihê cihê projeyên aştiyê pêşkêşî hevdu kirin. Projeyên herdu aliyên jî nêzî hev in û cudayiyên ku hene ji nabin asteng ku aştiyê berdeyam pêk were. Bi hêviya ku di demeke kurt de aştiyê pêk were û ew destkeftiyên gelê me yên li başûrê Kurdistanê tîk neçin, em pêşniyarên herdu aliyên jî pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.

Pêşniyara PDKê

Pêşniyara PDKê ji çar qonaxan pêk tê û di 10'ê Hezîranê de hatiye pêşkêşkirin.

Qonaxa yekem: 1- Li hemû deverên Kurdistanana Başûr şerî rawestandî. 2 Propagandeyên li dijî hev tînin rawestandî.

3- Hemû awa karên ne qanûnî tînin rawestandî.

4- Hewlêr, muhafizên meqaran jî tînin rawestandî, an jî li gor li ser bêtî lihevkerî jî herdu aliyên wek hev hin hêz jî bo azadiya hatûçûnê tînin destnîşankirin.

5- Ewlekariya bajêr û der û dorê ji aliyê partiyên Kurdistanî û INC ve tînin parastin.

Mohleta pêkanîna vê qonaxê hefteyek e.

Qonaxa duwem: 1- Hêzên herdu aliyên jî ji baajrê Hewlêrê tînin bidûrxistin.

2- Hemû mal û trîmbêlên hemwelatîyan ku ji wan hatine standin li wan tînin veqerandin, ku rewşa şertên veqerandinê tu-



Mesûd Barzanî

nebe, tazminat tîdayin.

Ev qonax ji tarîxa lihevkerî û şûnde di nav du hefteyan de pêk tê.

Qonaxa sêyem: 1- Parlamentoya Netewî ya Kurdistanê ku otorîteya herî bilid e, dest bi karê xwe û xebata damezrandina hukûmetê koalîsyonî ya nû dike.

2- Hukûmeta nû di warê ewleyî û aborî de, hemû otorîteya xwe bikar tîne hatin û çûyanin ji bo xizmeta gel li gor qanûnê bikar tîne.

3- Hukûmet û Parlamento, bi INC û partiyên din ên Kurdistanê re ji bo normalîzekirina rewşa Kurdistanana Îraqê û karên ne qanûnî yên di dema krîzê de jî tînin de, hevkarîyê dikin.

Ev qonax ji tarîxa lihevkerî û şûnde di nav mehekê de pêk tê.

Qonaxa çarem: 1- Piştî bicîhanîna qonaxa sêyem, herdu partî jî bo prosesa siyasî ya azad danûstendî xwe xurt dikin.

2- Herdu partî jî bo hilbijartina azad ya parlamentoyê ku di bin çavdêriya zêrewanên navnetewî de bê kirin xebatê dikin.

3- Ji bo civandina kongreya netewî di demeke kurt de, xebat tînin kirin.

Pêşniyara YNKê

Pêşniyara YNKê ji pênc qonaxan pêk tê û di 12'ê Hezîranê de hatiye pêşkêşkirin.

Qonaxa yekem: Rawestandîna şer

a- Ragihandina rawestandîna şerî ji dezgehên ragihandîna herdu aliyên.

b- Teblîxkirina vê biryarê bo hemû hêzan.

c- Heyeta Çavdêriyê ku li ser îtifaqê tînin kirin, rawestandîna şer li hemû nuxteyan kontrol dike.

Mohleta pêkanîna vê qonaxê 12 saet in.

Qonaxa duwem: 1- Parêzgeha Hewlêr

a- Belavkirina hêzên herdu aliyên wek hev ji Selahedîn heta Qûştêpe, ji Dîkelê heta Kelekê, li deverên li ser îtifaqê tînin kirin.

b- Valakirina bajarê Hewlêrê ji hemû meqerên çekdar, çekdarên lê hene hemû biçin ciyên ku di benda" a"yê de li hev hatiye kirin.

c- İzin nayê dayin ku mufreyên hiç aliyekî jî herdu aliyên tînin bajêr.

d- Li ser muhafizên ku meqaran diparêzin îtifaqê tînin kirin.


e- Berpirsiyarên herdu aliyên ên ku tînin Hewlêrê û jê derdikewin, li gor îtifaqê hejmareke kêm muhafiz li gel xwe tînin.

f- Heyeta Çavdêr van qeraran bi cî tînin û plana selametiya van kesan û rîya çûn û hatina wan tespît dike.

g- Parêzger û cigirê wî dest bi karê xwe dikin û ji bo ewleyiya bajêr bi komîteya Parlamentoyê ku ji parlamentarên Hewlêrê yên hersê listeyan pêk hatiye hevkarîyê dike.

h- Hêzên herdu aliyên jî bajar û bajarokên Hewlêrê vedikişin û berpirsiyar dest bi karê xwe dikin.

2- Hemû hatinên gumruka Brahîm Xelîl û gumrukên din,



Celal Talebanî

bi çavdêriya Heyeta Çavdêr teslîmî xezîneya merkezî dibin.

3- Rawestandîna kiriyarên her tereffî li dijî alîgirên tereffî din. Dema pêwîstiyek qanûnî hebe organên qanûnî yê yekê dikin.

Mohleta pêkanîna vê qonaxê 10 roj in.

Qonaxa sêyem: Dest bikarkirina dezgehên herêmê.

a- Parlamento dicive û civînên xwe yên normal dike.

b- Hukûmeta nû li ser bingeheke fireh ava dibe.

c- PDK û YNK, hatinên hukûmetê yên ku ji 2.5.1994'an û virde dest dane ser eşkere dikin û teslîmî hukûmeta nû û Parlamentoyê dikin û organa berpirs van hesaban kontrol dike.

Mohleta pêkanîna vê qonaxê mehek e.

Qonaxa çarem: Herdu alî bi hemû aliyên muxalefeta Îraqê re -INC û yên din- li dijî diktatoriyê û rûxandina wê û alternatîfê demokratîk, parlamentarîst û federal îtifaqê dikin

Qonaxa pêncem: Normalîzekirina rewşê li hemû deverên herêmê di bin kontrola Heyeta Çavdêr de dest pê dike.


Mohleta pêkanîna vê qonaxê 15 roj in. □

Serokê Enstituya Kurdî ya Parîsê Kendal Nezan:

"Gelê ku ji alî mêjî ve belengaz, çiqas fedekar û mêrxas be jî, zû bi zû nikare zincîrên bîndestî û nezaniyê bişkêne"

".....Şerê çekdarî yê PKK'ê fersendeke zêrîn da dewletê ji bo bicîhanîna vê projeya stratejîk û pûçandina potansiyela demokratîk a Kurdî. Lê îro êdî tîr ji kevanê derketiye, gelê me û welatê me çar alî di nav agir de ye. Feyda hefî û gazincan nîne. Jiyan ne tiyatro ye ku em bêjin "me cara pêşîn xeletî kir, rola xwe baş neleyist, emê vê carê baştir bileyzîn". Kurd êdî wekî gelekî li Kurdistanana Bakur ketine şerê heyin û neyînê. Loma divê ku amanca sereke ya hemû welatparêzên Kurd ew be ku vî şerî bidin rawestandî. Pêşî li koça Kurdan û valakirina Kurdistanê bigrin, ji mantiqa felaketî ya şerê çekdarî derbasî mantiqa şerê siyasî yê demokratîk bibin, alternatîfê demokratîk bidin peyda kirin. Kurd dikarin di hemû waran de xurt bin, rejîma tîrk îzole bikin û meşrûiyeta doza xwe bi raya giştî ya cihanê bidin qebûl kirin, ji bilî warê şerê çekdarî....."

Rûpel: 8-9



Ji Armançê

Wek hinek xwendevanên me ji dizanin hewl daneke me hebû, ku em weşana Armançê li Tirkîyeyê bidin domandin. Lê ji ber dirêjajotina mercên huqûqî û teknîkî me ev hewldana xwe di nivî de hişt. Heta ev rewş amade bibe em dê weşana xwe li Swêdê bidomînin. Ji ber vê yekê Armanç di dema

xwe de negihaşt destê xwendevanên me, bibûrin!

Wek hûn ji dibînin me di Armançê de hinek guhertin çê kirin; me forma wê hinek piçûktir kir û rûpelên wê ji zêde kirin. Quncika "Rojeva Mehê" bû "Rojev" û ya "Ramanên Ramanweran" jî, bû "Raman". Quncika "Ne karê aqila ye, lê rast e" jî bû "Zanist û Teknik". Rûpelên

Dimilî û Wêjeyê zêde bûn û Armanç bû 16 rûpel.

Me hejmara endamên redaksiyonê jî zêde kir. Em xêr hatinê li **Emîn Narozi** û **Ehmed Huseynî** dikin. **Remzî Kerîm** bû Redaktorê Berpirsiyar ê Armançê. Berê jî wî bi navê **S. Rêving** di redaksiyonê de kar dikir.

Hin xwendevanên me endamên redaksiyona me meraq di-

kin û gazinan ji me dikin ku ew nayên nas kirin. Ji bo wê jî me navên wan yên ku di civatê de tên naskirin, nivîsandin. **Mîrze Bextiyar** ji vir û pê de êdî bi navê **Mumtaz Aydın** û **Lewend Firat** jî bi navê **Faris Can** de di redaksiyonê de karê xwe bidomînin.

Heta hejmareke din bimînin di xweşiyê de.



Nameyên Xwendevanan



Me digot qey AIDS bi riya seksê belav dibe

Bê durûtî û pesindan, em "Armançê" yek ji rojnameyên Kurdî ya pêşîn dibînin, bi dilê germ wê distînin û dixwînin û gava ew li me dereng dikeve, em bêriya wê dikin. Hêviya me jî ve namê jî tenê pêşdeçûn û rindtîrbûna "Armançê" ye.

Wek em dibînin, rojnameya giranbuha, herî nav û terminên ne Kurdî, bi cûrê ne Kurdî, dinivîsîne. Em behana vî rengê nivîsarê fêm nakin û durust nabînin. Di nêrîna me de, ev cûrê nivîsandinê tenê ji xwendevanên Ewrûpayê re tê nivîsandin, lê xwendevanên "Armançê" ne tenê li Swêd û Nerweçê ne. Loma jî divê hemû nav û tîrm li gora qanûnên nivîsandina zimanê me bêne nivîsandin da ku hemû Kurd, li hemû derê, jê fêm bikin.

Ji vî cûrê nivîsarê çend nimûne:

Nivîsara Armançê:

François Mitterand
George Bush
Clinton
Octavio Paz
Marco Polo
Stockholm
Chicago
Arthur Rimbaud
Honecker
Vaclav Havel

Pirs ew e, gelo di rojnameyên Ewrûpî de, navên Kurdî wek bi Kurdî yan wek ku di zimanên Ewrûpî de tên nivîsandin? Û gelo heger em navên biyanî wek di zimanê eslî de tên nivîsandin, binivîsîn, emê çawa problema na-

Çima ne?:

Franswa Mitteran
Corc Bûş
Klinton
Oktovio Paz
Marko Polo
Stokholm
Şikago
Artûr Rêmba
Honeker
Vaslav Havel

vên Japonî û yên Erebi, çareser bikin?

Di zimanê me de gotin çawa tê nivîsandin, wisa jî tê xwendin. Li gora vê bendê, heger em navên biyanî weke zimanê eslî binivîsîn, em bilêvkirina wan na-

van diguherin. wek nimûne navê "Clinton", Amerîkî navê serokê xwe bi "C" dinivîsîn, lê ji ber ferqa bilêvkirina tîpa "C" di zimanê îngilîzî û Kurdî de em nikarin navê serokê **DYA** yê bi "C" yê binivîsîn, çimkî wê feqîro di nav cilikan de bimîne.

Bi rastî jî mêj ve ev yek bala me dikşîne, lê gava me ev hejmara dawî, ya sibat-adar a 1995'an stend û tê de xwend ku: "AIDS di rêya sexê re belav dibe", me biryar da ku em vê nameyê jî we re bişînin.

Navenda Lêkolînên Kurdî li Mosko

Prof. Şakiro Mihoyî
Keder
Dr. Beşîr Sebrî Resûl
Silêman Alî

Karbidestên hêja yên kovara Armançê

Digel rêz û silavan li rêka dîr, destên we xizmetkarên tore û ferhengê, we tore van û xebatkarên dilovan bi germî û bitayane diguvişînin û mandî nebûnê dibêjin hewe. Em herdem selamê û serketina we birêzan li dergeha Xudayê mezin û dilovan daxwaz dikin.

Hevalên delal û dilovan! Navenda Weşandina Tore û Ferhenga Kurdî, Weşanxaneya Selaheddîne Eyyûbî, bi şanazî û serfirazî kutabûna dehsaliya xizmetên ferhengî yên xwe ji bo hemû Kurdên cihanê û bi taybetî Kurdên Îranê radigihîne.

Em bi rijdî li ser vê baweriyê ne ku herçî serketinên me yên di warê xudankirin û parastina tore

û ferhenga gelê Kurd û xizmet ji bo pêşdebirin û berfirehkirina wê, bi saya hevkarî û peywendiyên dostane û birayane yên hemû ramanvan, hozan, nivîskar, mejûnivîs, dîrokzan, lêkolîner û hunermendên hêja yên gelê Kurd li seranserê cihanê bûye. Lewra navenda me, erka ser şanê xwe dizane ku ji tevayî wan hevalên hêja û birêz ku li dirêjahiya deh salan bi her cûreyî alîkariya me kirine, ji dil û can sipasiya wan bike û rêza wan bigre.

Çi guman di wê de nîne ku roja îro li nav van hemû pêl şepêlên aloziyê, gêre û kêşe, lêkdan û zorkarî, xwînêjî, dijayeti, neyartî û nebawerîya ku pişkek zor li cihanê daye ber xwe, lêkolîn û

xebatên zanistî, ferhengî û li ser hemîyan re xizmeta tore û ferhenga gelên bindest ku gelê Kurd yek ji wan gelan e, ne tenê karekî pirr hêja, bi nîrx û girîng e, belkû ev kar dikare pêngavek baş be ji bo serrastbûna beraberî û wekhevîya nîveka ferheng û toreya gelên cihanê û mizgîndera hevdiilî û pêkghîştina netewayeti û navnetewayetiye û herwisane bibe hegera weşandin û berfirehkirina zanist û nasîne li seranserê cihanê. Ev yek di rastiyê de armanca me ya bîneşeyî û bernamaya me ya serekî û erka me ya ferhengî ye. Bername û erkên ku serketinên wê dişa li girewa hevkarî û alîkariya nivîskar û

rewşenbîrên gelêrî yên gelê Kurd de ye.

Di dawiyê de em pêdivî dizanin careke din pêxweşî û şanaziyên xwe li ser domandina hevkarî, peywendî û dan û sitendinên ferhengî ku heta nûha jî bi rêkirina kovar, pirtûk û berheman berdewam e, ragehînin û ji we daxwaz bikin ku ev peywendî û dan û sitandin her weha berde-
wam be.

Şad û serketî bin.

Navenda Tore û ferhenga
Kurdî-Weşanxaneya
Selaheddîne Eyyûbî

Li ser dîroka dîne Êzîdî

Lazim e rastîya dîne Êzîdî, di nava tevgera neteweyî ya Kurdî de îro jî, wek demên derbasbûyî neyê fetisandin.

Wexta meriv bala xwe dide dîroka Kurdistanê, meriv dibîne bi sedan mîlet û qewmîyet hatine ser axa Kurdistanê, gelek ji wan mîletan dewlemendîya Kurdistanê bi xwe re birine, hin ji wan heta îro jî li pêşîya tevgera rizgarîya Kurdistanê bûne asteng.

Her çiqas çend dîroknas û rojnamevanên Kurd, hebûna mîletê Êzîdî wek koka Kurdan a kevn qebûl dikin jî, lê belê bi rastî hîn di nava tevgera neteweyî ya Kurdî de tu lêkolînên berfireh û eşkere di vî warî de

nehatine kirin.

Kesê li ser dîroka Kurdistanê xwenda be, an jî lêgerîya be, dizanin ku Êzîdîyan her wextî bi eşîr û qebîla xwe ve, di nav sînoren xwe yên teng de, di nav deşt, banî û çiyayên Kurdistanê de jiyana xwe domandine.

Dijminê dîn û mîletê me, her wextî, gund û warên Êzîdîyan, xan-xerabe kirine, mal û milkên wan talan kirine. Êzîdî jî ber zilm û zora kevneperest û paşverûyan gelek cî di nava Kurdistanê de guhartine, tûşî qetliaman bûne.

Eşîr û qebîlê Êzîdîyan, her wextî di nava welatên xerîb û

mintiqên xwe de, ji bo azadî û serxwebûna Kurdistanê, li dijî dijminên Kurdan gelekî xwîn rijandine. Urf, adet û zimanê xwe, bi olperestîya xwe parastine.

Ez hêvîdar im ku redaksiyona Armançê, wê li ser vî warî jî bisekine. Ku lêkolînên li ser rewşa Êzîdîyan li cem we hebin, ji xwendevanên xwe re di rûpelên Armançê de biweşînin.

Ev birîn ne birîna gulle û xenceran

Ev hesret ne hesreta keç û kuran

Ev evîn ne evîna xweşik û delalan

Ev serê çend hezar salan e

umîda delalan

Ronahiya çavan, quweta dest û lîngan

Me ne dibistan û ne jî mamoste

Hoste û rêberê me ew e evîna dilan

Timî bi devkî ji bavan ge-hişte lawan

Eva çiqas war tene guhertin, nayê hesaban

Hîn jî wek dema berê, li ser sera û ser çavan

Bi silavên biratiyê
Bavê Şêran
Almanya

Armanç

Rojnameya Kurdî ya
Mehane
&
Monthly Kurdish
Magazine

Redaksiyon

Mumtaz Aydın
Faris Can
Mûrad Ciwan
Nihat Elî
Ehmed Huseynî
Remzî Kerîm
Mahmûd Lewendî
Hesen Mizgîn
Emîn Narozi

Redaktorê Berpirsiyar
Remzî Kerîm

Berpirsiyarê beşê Dimilî:
Malmîsanîj

Şeretên Abonetiyê/
Prenumeration:

Abonetiya Salekê

Skandinaviya: 250 SKR
Ewrûpa: 60 DM
Derveyî Ewrûpayê: 50 \$

Maqam/ Myndigheter
450 SKR

Anons/ İlan
niv rûpel/ en halvsidan
2500 SKR

Adres:

Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden

Tel: +46-8- 803135
Faks: +46-8-801825

Postgiro: 4972255-6

Utges av:

Kurdiska Demokratiska
Arbetsunionen

ISSN: 0348 7385

Mûrad Ciwan

Rojev

Pirsa di serê min de

Ordiya Tirk, rojekê berî Newrozê careke din êrîş bir ser Kurdistanê Iraçê. Kurd, Tirk, der û dorên siyasî yên herêmê û yên Rojava, bi germî li ser sedemê ve êrîşê, armanç û encamên wê radiwestin. Muna-çeşkirina sedem û encamên buyereka wiha, gelekî tebîî ye. Ordiya dewletekê, ji bo ku hin "hemwelatî" yên xwe yên serîhildayî pûç bike, 35 hezar eskerên xwe, bi tank û top û teyaran dixwe nava hudûdê dewleteke din, bi 350 km dirêjahî û 40 km kûrahî axa miletekî bînpê û bombaran dike. Helbet bêperwariyek wiha, wê bala dinyayê bikşîne. Hin, ji alî maf û azadiyên miletekî, hin, ji alî xwedîderketina mafên mirovayeti, hin, ji alî pîrensîbên hukumraniya dewletan û hin ji alî tirsaya siyaseta êrîşkariya hegemoniya dewleta Tirk, li hemberî ve êrîşê radiwestin, bahanên dewleta Tirk ên li ser "parastina xwe, ji terorê" didin aliyekî û dixwazî sedemên esasî derxin holê.

Sedemên ve êrîşê, dewleta Tirk çî çivan dide xwe bila bide xwe, diyar in. Ev yek, di beyanên berpirsiyarên siyasî yên Kurdistanê de jî û ji alî kes, hêz û dezgeyên netewî û navnetewî yên mafên mirovan jî tên diyarkirin. Hukumet û dezgehên si-yasî yên Rojava

bahanên dewleta Tirk di cih de nabînin, daxwaza wê yekê dikin ku di kurttirîn demê de ordî ji Kurdistanê Iraçê vekîşe, siyaseta şiddetê ya li hemberî Kurdan bê rawestandî û çareserkirinek adil û demokratîk ji bo pirsaya Kurdî bê dîtin.

Ev hemû endîşe, hêrs û daxwazên ku tên kirin li cî ne, bi heq in. Lê di demek wiha de, di germiya van munaqesê û muhawelan de ku ji bo ve buyere tê kirin, nîzanim çima, her û her aliyekî din e meselê min meşxûl dike. Pirsê di quncîkekî serê min de asê bûye, ez dikim nakim ji serê min dernakeve. Gelo bi tu awayî û tu riya îmkân hebû ku mirov bîkarîbûya rê li ber ve êrîşê û yên wek ve bigirtaya, yan mesrefa wê ya maddî û manewî çend qat girantir bikira ku careka din êrîşkarekî ku gava bixwesta êrîşê bîne ser Kurdan deh qatê din bifikirîya û piştî biryara xwe bidaya. Gelo me Kurdan heta çî dereceyê siyaseteke welê meşand ku em rê li ber ve êrîşê û bi dehan êrîşên berî ve bigirin, yan qet nebe ku em karibin nehêlin ku êrîşkar wiha zû bi zû, bi erzanî, ji xwe re bahanan bibînin û welê bê astengên mezin, axa welatê me li vî û li wî aliyê bikin meydana cirîdên hespên xwe.

Ka em bînin bîra xwe, rojên

berî ve êrîşê, rewşa Kurdistanê çî bû: Li Kurdistanê Iraçê, PDK û YNK di şerekî navxwe yê herî dijwar de bûn ku hukumeta dewleta federe felc kiribû, parlamento li ber singû û postalên pêşmergan bela bûbû, ewleyiya jiyana mirovan nemabû; aborî, ticaret, çandî, kar û çûn û hatina nav welêt hema hema rawestiyabû. PKK û hema bêje hemû partiyên Kurdan û Kurdên ne bi wê re ji xwe ji berê de ne li hev bûn, siyaseta navbera wan ji ya navbera dijminan jî kurtir û dijwartir bû. YNKê, dengê radyoya Partiya Demokrat a Kurdistanê Iranê birrî bû.

Yanî berî ku dijmin xwe bigihînin Kurdan, wan xwe bi xwe serê hev dixwarin. Jixwe siyaseteke millî ya muştêrek tunebû ku rê li ber êrîşê û xeterên nêzîk û dûr, ên rasterast û yên potansiyel bigre, xeterên mezin bertêref an tecrîd bike, zêfîyên muhtemel yên di nav Kurdan de rake yan kêmbike. Her wiha mirov nedidît ku yek bi yek partiyên Kurdan jî bi aqilê selîm e millî dilivîyan. Heke bilivîyana, gelo YNK an PDK cesaret dikir ku di demeka wiha de ku çar alî gurên har in, her yek ji aliyekî de qîlên xwe li Kurdan pîj dikin, şerê navxweyî derxe. Wê Celal Talabani bifikirîya ku mesele ji mesele pûçkirina Mesûdî wêdetir e, yan jî wê Mesûd Barzanî bifikirîya ku esas pirs ne ew e ku Celal bi heq e an bêheq e. Çawa dibe bila bibe, divê gavêk welê neavêje ku Kurdistan tekeve nava rewşeke welê ku rê

li ber êrîşên dijminê veke. Loma jî wê bifikirîya ku eger mesele, parvekirina pereyên Gumruka Ibrahim Xelîl e, ne ji bo tirsaya jî YNK, lê ji bo tirsaya jî êrîşên dijminên çaralî, ji bo selametiya milletî û rêliber-girtina leyistikên xêrnexwazan ev pere pê re parvebikira, ya herî rasttir pê re li hev bikira ku ev hatin, di rêka hukumeta federalî û parlamentoyê re ji bo lazîmyên milletî bî serfikirin. Mesela aqilê selîm e milî jî bo PKK û hemî hêzen her çar perçên Kurdistanê yên din jî dişê bê gotin. Mesele mesela aqilê selîm bûya, diviya PKK tu caran ew cesaret di xwe de neditaya ku dijminatîya PDK Iraçê, ya YNK û hemû hêzen din bikira.

Belkî jî ya herî girîngtir, aqilê selîmyek wiha, hetta kultura ku karibe ve peyda bike û li piyan bihêle, bi miletê Kurd; yeko yeko bi ferdê Kurd bi xwe re tune. Heke hebûna partiyên siyasî, serok û berpirsiyarên partî û hêzan, ev siyaseten îroyîn nedimeşandin, nedikarin bimeşînin û heke bimeşandana jî di wê rewaca xwe de nediman..

Ne bêsedem e ku gava dostekî Kurdan bala xwe dide wan, mit û mat dimîne, tu tiştî ji wan fahm nake û dibêje "çawa dibe, Kurd nikarin wan xeterên mezin ên li ser û dora xwe bibînin, wekî ku çu xeter tunebin, li der û dora wan her tişt aram û berkemal be, berê xwe dane hev. Ev çî milletekî ecêb e, ya Rebbî!"

□

Nûçe

Tirkiye di çek kirîne de yekem e

Di sala 1994'an de, dewletên ku herî pir çek kirîne, Tirkiye û Yunanistan e. DYA (Dewletên Yekbûyî yên Amerîka) û Almanya jî dewletên ku herî pir çek firotine ne.

Ev agahdarî, piştî lêkolîneke pîralî, roja 4.4.-1995'an de hat diyarkirin. Di nav amadekarên ve raporê de Enstîtuya Navneteweyî ya Lêkolînen Aştîyê li Stockholmê jî heye.

Çekên ku hatine firotin, nivê wan çûne Ewropayê. Ji vana jî para mezin çûne Tirkiye û Yunanistanê.

Jixwe malûm e Tirkiye van çekan ji bo çî armançê û li ku derê bi kar tîne.

Her weha li gor lêkolîneke din; Tirkiyeyê di navbera salên 1989 û 1993'yan de bi 7,7 milyar dolarî çek kirîne û piştî Hindistan, Japonya û Erebiştana Suûdî di rêza çaran de cî digre. Piştî wê bi 6,3 milyar dolarî ve Yunanistan û Afganistan tên.

Dewletên ku di van çar salan de herî pir çek firotine jî DYA û Rûsya ne. DYA'yê bi 56,6 milyar dolarî û Rûsya'yê jî bi 35,4 milyar dolarî çek firotine. Almanya bi 8,7 milyar dolarî sêyem, Fransa bi 7,8 milyar dolarî çarem, Îngiltere bi 6,6 milyar dolarî pîncem û Çîn bi 5,7 milyar dolarî şeşem e.

Kurdistanê Başûr

Hilbijartina
Parlamentoyê
ma sala 1996'an

Parlamentoya Kurdistanê Iraçê roja 27'ê Gulanê de li gundê Daraban yê nêzîkî Hewlêrê civînek çekir ku 15 deqîqeyan ajot û biryar dan ku hilbijartina parlamentoyê ku diviyabû di 4'ê Hezîranê de çêbibe, sala bê yanê 1996'an de di meha hezîranê de çêbibin. Di ve civîna parlamentoyê de 85 parlamenter beşdar bûn û ji bo ve biryarê dengê xwe dan.

Lêborîn

Di kasetaya min a dawî "Min sar e" de stîrana Narê bi xelî wêk a min hatiye nivîsandin. Lê ev stran a gellerî ye. Ez ve şaşiyê rast dikim û uzra xwe dixwazim.

Birader

Tahsîn Taha mir, dê sitranên wî bijîn

Hunermendê hêja Tahsîn Taha di 28'ê Gulana 1995'an de li Hollandayê ji ber nexweşiya dil, çû ser heqîya xwe. Bila serê malbata wî, serê dengbêj û hozanên Kurdistanê û serê gelê Kurd sax be. Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraçê ji bo Tahsîn Taha di 3'yê Hezîranê de li Stokholmê civînek bîranîne çêkir.

Tahsîn Taha Mihemed Selîm, di sala 1941'ê de li nehîya Bêgo ya ku dibêjinê Nêrwe ji dayik bû. Bavê wî katibê nahiyeyê bû. Ji ber ku bavê wî karmendê dewletê bû, ew li gelek cihan geriyaye. Wî pêngava xwe ya yekê ya hunerî li Mangêjkê avêt. Paşê çû Amediyê, heta sala 1960'î ew li Amediyê ma. Piştî ew ji Amediyê çû Zaxoyê. Her wê salê ew li wê xwendîngeha hunerî hatiye qebûlîkirin. Di sala 1964-65'an de, piştî ku



wî xwendîna xwe xelas kir ew neqlî Mexmûrê bû. Pînc salan li wir man. Paşê çû Hewlêrê, di sala 1994'an de jî derket derveyî welêt.

Hîn ew 7 salî bûye, carekê Mihemed Arif digel bavê wî

jîre gotine; "ka bo me sitranekê bêje." Wî jî sitrana "Were Hêyo" gotiye. M. Arif jî bavê wî re gotiye "dê ji kurê te sitranbêjekî pir baş derkevît".

Di sala 1960'î de beste û meqama sitrana xwe ya yekê "Derdo û dilo ez bîrim" li Radyoya Bexdayê di beşê Kurdî de tomar kir. Di sala 1963'an de ji aliyê BAAS'ê ve hat girtin. Di sala 1970'î de cara yekem ji bo televizyonê sitrana bi navê "Behdînan" çekir. Di navbera salên 1977-78'an de wî du opera derhênan.

Li gel huneremeniya wî ya pîralî, Tahsîn Taha stranbêjekî bi nav û deng bû. Wexta me berê sê salan pê re hevpeyvînek çekiribû, wî li ser stranên weha digot; "tiştê ku ez dizanim

miletê me hez ji stranên zehmet nake. Milet hez ji stranên sivik, yên ku zû ji ber dibin, dikin. Mesela min gelek stran gotine, yek ji wan jî bi navê "Derew" e, ev stran hem bi naveroka xwe û hem jî bi awaza xwe ve zehmet û dewlemend e ku ji çar kupriyên rengê reng pêk tê. Lê mixabin nekete mêjiyê miletê me. Belê bo nimûne sitrana "Behdînan" ku besta wê ya bavê min e, wek bombeyekê teqîya."

Wî carna di salekê de dehdonzdeh stran çêdikirin, li gor wî digot, ji van yek an du ji aliyê xelkê ve dihat hezkirin.

Wî bi xwe jî jimara stranên xwe nizaniyê. Lê di radyoya Kurdî a Bexdayê de li dora 100 stranên gotine. Nêzî 500 stranên wî hene. Ew bi xwe dibêje ev tişt bihayê xwe nîne. Ya girîng buhayê stranê ye.

□

Raman

Tevgera Kurd û Dema Nû

R. Mûrad

Di tîkiliyên nav dewletan de bingeh hertim menfaetên aborî bûne. Ji bo bîdestxistina îmkân û qezencên aborî, van dewletan çav ji nakokiyên hevdu re girtine û gelek caran jî bi awayekî li dijî hiqûqa navxwe û ya navnetewî piştigirîya hevdu kirine û xwestine ku kirinên hevdu veşêrin.

Berî ku sistema Sovyetê tîk here, welatên wekî Tirkîyeyê li hember komunîzmê wek herêmên stratejîk hatine hesabandin û ji aliyên aborî, siyasî, diplomatîk û eskerî, piştigirî û alîkarî standine. Ewropa û Amerîka li hember Sovyetê, dîktatorên eskerî diparastin û çav li kirinên wan dîktatoran digirtin. Lê piştî tîkçûna sistema Sovyetê, welatên wekî Tirkîyeyê beşek gelek mezin ji ehemmiyeta xwe wenda kirin.

Di dema şerê sar de, sînoren heyî, "pîroz" dihatin hesabandin û guhertina wan sînoran, ji bo nîzama di nav herdu hêzên super de wek talûke dihat dîtin. Mafên miletên bindest di nav wan sînoran de dihat fetisandin. Wan dewletan sînor bi hin peymanan wekî KEA (Konferansa Ewlekarîya Ewropa) meşrû kirin û rîayetî sînoren heyî, dikirin. Lê piştî tîkçûna Sovyetê guhertina sînoran hat rojevê û ket jîyanê. Di nav gelên bindest de hêviyê mezin peyda bû ku tu sînor ne "pîroz" in û eger rewş û şert musaît bin, guhertina wan mumkun e. Ev hêvî bû sebêbê daxwazî û hewildanên "nû" û her weha bû talûke ji bo wê statukoya ya ku ji aliyê Ewropa û Amerîkayê ve tê parastin. Li welatên wekî Tirkîye, Îraq û Îranê tevgerê xurt ya netewî ya Kurdan û li welatên Asyayê jî tevgerên millî û demokratîk yê Tamîlî, Kaşmirî ûwd geştir bûn û li herêmên xwe bûn faktorên siyasî.

Li gor raporên CIA û pisporekî tîkiliyên navnetewî, edî ji şerê di navbera du dewletan zêdetir, talûka şerên di nav dewletekê bixwe de di rojê siyasî ya dinyayê de ne. Sebêba van şeran daxwaziyên millî ne ku van salên dawî de aktualîze û înter-nasyonalîze bûne. Di vê "nîzama nû ya dinyayê" de, îmkana gihandina dangan û kartêkirina (tesîr-lêkirina) raya giştî ya dinyayê zêdetir bûye. "Nîzama nû ya dinyayê" jî, piştî tîkçûna Sovyetê hate telfûzkirin. Helbet dewletên antî-komunîst ji berê rehetir dikarin demokrasî û heqê mirovan biparêzin bêyî ku tawîzan bidin komunîzmê. Bi bawerîya min sebêbê herî esas yêvê

"nîzama nû" ev e: Welatên Rojava, li hember daxwaziyên millî û netewî ku li hember parastina statukoyê wek talûkeyek mezin dihatin dîtin, şîra demokrasî û heqên mirovan dan pêş. Bi taybetî Amerîka xwest û dixwaze ku bi van şîran, miletên rizgarîxwaz ji daxwazên nasyonalîst veqerîne, wan bi "demokrasî û heqên mirovan" razî bike. Arman dîsa jî parastina statukoyê ye ji ber ku çareserîkirinên millî yan jî pêkanîna pren-sîba "self-determination" (heqê çarenûsî) ji bo guherina sînoran rê vedike.

NATO, hewildanên nû û pêşeroj

Dema talûka komunîzmê hebû, motîvekîrîna raya giştî ya welatên rojava û bi taybetî yê Natoyê, li hember Sovyetê gelek rehet bû, ji ber ku menfeata wan di nav cepheyek antî-komunîst de digihîşt hevdu. Lê piştî tîkçûna sistema Sovyetê, nakokiyên di nav wan dewletên Natoyê û dewletên din yê Ewropayê de, xwe nîşan dan. Fransa, ji bo organîzasyonê nû ku wê girêdayî Yekîtîya Avrûpayê be, hin dîtinan tîne holê. Daxwazîya Fransayê di warê politîkaya ewlekarîyê de ev e; organîzasyonê leşkerî ku girêdayî Federasyonê Ewropayê be û bikaribe bi serê xwe oparasyonên leşkerî bike. Lê Brîtanîya ji ber tîkiliyên xwe û Amerîkayê, bi tevahî li dijî Yekîtîya Ewropa ya Federatîf e û piştigirîya organîzasyonê nû ya leşkerî ku îhtîmal e pêş de bibe alternatîfa NATO'yê, nake.

Piştî hilweşandina Pakta Warşovayê, welatên wekî Polonya, Çekoslovakya û Macarîstanê daxwazîya beşdarbûna NATO'yê kirin. NATO jî dixwaze ku vê valahîya ku piştî tîkçûna Pakta Warşovayê peyda bû, bi awayekî tije bike. Rûsya li hember van pîlanên astenga herî mezin e, ji ber ku Rûsya hîn jî dixwaze li herêmê wek berê bibe faktorê û dixwaze hem li ser Ewropayê û hem jî li Asyayê otorîta wê hebe. Tevî ku Rûsya beşdarbûyîna pîrojê "Şirîktîya ji bo Aştiyê" qebûl kirîye, dîsa jî li dijî fi-rehbûyîna NATO'yê ye. Eger Rûsya entegrê Avrûpayê nebe, îhtîmal heye ku Rûsya ber bi rojhilat ve xwe bîkşîne û bi welatên wekî Hindîstan, Iraq, Sûriye re paktên nuh ava bike.

NATO, ji bo jiyana xwe bîdomîne û wekî berê endamên xwe motîve bike, divê piştî tîkçûna Sovyetê "neyarek" nû

bîbîne û xwe li gora wê mobilîze bike. Ev neyarek nû jî, îslaman jî îslamîstên radîkal in. NATO'yê, di roja 8'ê Sibata 1995'an de biryar sitend ku ji bo hevkarîyê stratejîk, bi Mîsir, Îsrail, Fas, Tûnis û Morîtanîyayê re tîkîlî deyne. Li aliyê din konsolosê NATO'yê Îspanyayê Carlos Miranda, îşaret dike ku ev hevkarî ne sêfêra xaçperestan a li hember îslamîstên radîkal e. Lê sekretêrê giştî yê NATO'yê Willy Claes, li Almanîyayê di konferansê ewlekarîyê de weha dibêje: "Mîsilmanên fundamantalîst (radîkal) îro, wekî komunîzma do, li hember NATO û ewlekarîya Rojavayê talûke ne." Li gor hinekan jî, NATO jî bo çêkirina sîstemê robotên nû hazîrîyan dike. Ev sîstem dê wan li dijî "hicûmek ji rojhilata navîn" biparêze. (Dagens Nyheter 9.2.1995)

Bi bawerîya min ev encamên nû, ji bo Kurdên Sûriyê, Îraqê û Îranê pozîtîf in, çimkî helwestên wan welatên antî-Rojava û antî-NATO ye.

Lê ji bo Tirkîyeyê û Kurdên li Kurdistanê Tirkîyeyê meriv nikare eynî tiştî bibêje. Tirkîyeyê heta tîkçûna Sovyetê piştigirîyê xurt a siyasî, aborî, dîplomatik û eskerî ji Amerîka û Ewropayê distend. Wan welatan jî ber sedemên jeo-polîtîkî yê Tirkîyeyê her dem çav li kirinên Tirkîyeyê yê li hember Kurdan digirtin. Lê piştî sala 1990'î, ji aliyê Ewropayê li hember kirinên Tirkîyeyê; kuştina insanan, xirabkirina gundan, îşkence, zordarîya li ser çapemenîyê ûwd. helwestek nû xwe nîşan da. Yekîtîya Ewropa û parlamentoya wê, rêxistinên humanîst û demokrat bi awayekî giştî li hember Tirkîyeyê helwest danîn û welatên weke Norweçê ambargo ya sîlahan danî ser Tirkîyeyê.

"Talûka îslamîstên radîkal"

Lê tevî van gavan, di nav welatên Rojava de dîtinêk heye ku dibêjin îslamîstên radîkal li hember demokrasîyê û ji bo "Tirkîyeya demokratîk û laîk" bûne talûke. Argumenta Ewropayê ji bo pêkanîna peymana Yekîtîya Gumrukê bi Tirkîyeyê re, "talûka îslamîstên radîkal" e. Li gor dîtinan wan, pêwîst e Ewropa, ji bo Tirkîyeyê îzole nebe û îslamîst xurt nebin, tîkiliyên xwe bi Tirkîyeyê xurttir bike. Di vê çarçewê de wê Ewropa li hember pêşketina îslamîstan piştigirîya aborî, siyasî û eskerî bide Tirkîyeyê. Tiştê herî balkêş ew e ku helwesta Yekîtîya Ewropayê ku ji welatên ne endamên NATO'yê

ne jî pêk hatiye û yê NATO'yê wek hev e. Herdû organîzasyon jî îslamîstan wek talûke dibînin û tîkîlî û politîka xwe li ser vê bingehê ava dikin.

Do jî, welatên Ewropî û Amerîkayê li hember komunîzmê piştigirîya welatên wekî Tirkîyeyê dikirin û çav li kirinên wan welatan digirtin. Ji ber vê sebêbê, tu fîrset ji bo Kurda tunebû ku xwe û daxwazên xwe yê netewî tîxîn rojeva raya giştî ya dinyayê. Gelo dîsa ew roj paşve tîne? Ma wê Ewropa û Amerîka dîsa, talûka îslamîstan bidin pêş û piştigirîya Tirkîyeyê bikin û tevgera Kurd qurbanîya vî politîkaya xwe bikin?

Valahîya siyasî û Kurd

Valahîyek siyasî heye ku Kurd dikarin hêviyêkê jê bikin û xwe di wê de îfade bikin. Ew jî nakokiyên di navbera Yekîtîya Ewropa û Amerîkayê de ne. Di dema nû de, YE dixwaze ji berê zêdetir li Rojhilata Navîn û li herêmên din bibe faktorêk û ji Rûsya û Amerîkayê cuda politîka bike. Ew hewildanên YE ku bigîje encamêkê, îhtîmalê gelek mezin heye ku bi taybetî li hember Tirkîyeyê hin helwestên ji berê cudatir werin stendin û ew politîkaya nû dikare bibe fîrsetek ji bo Kurdan ku bikaribin xwe îfade bikin. Loma jî bi bawerîya min divê Kurd piştigirîya hewildanên ji bo avakirina avahiyên ewlekarî û siyasî wekî YE, YER (Yekîtîya Avrûpaya Rojhilat) ûwd yê ku wê bibin alternatîfa NATO'yê, bikin. Di siyaseta dinyayê de çiqas faktor hebin, ewqas Kurd dikarin di nav wan de, bi awayên cuda xwe îfade bikin û ji nakokiyên wan îstîfade bikin. Lê problema herî mezin ya Kurdan ew e ku, Kurd çar perçe ne û nikarin politîkayek yek rengî û netewî bimeşînin. Tu politîkayên welatên Ewropa û Amerîkayê ku bi giştî ji bo hemû Kurdan derbas dibe jî tune ye. Her dewletekê li ser her perçeyên Kurdistanê, politîkayek cuda heye. Ji ber vê yekê jî divê her perçe li gor şertên xwe politîkayê bimeşîne û tîkiliyên xwe jî li gora wê ava bike. Berî her tiştî, eger Kurd rewş û şertên siyasî yê dinyayê bi awayekî giştî bidin ber çavan û politîkayên xwe jî li gor wê biguherînin, ava bikin û bimeşînin, wê demê Kurd dê bikaribin bersiva hewcedarîyan bidin û gavên girîng bavêjin. Kadro, zanistî, bi hêzbûn û tîkiliyên xurt ku li ser dezgeheke netewî hatine avakirin, şertên avêtina van gavan in.

Nûçe




Sekreterê PDK-Îranê Ebdullah Hesenazade

PDK-Îranê

Sekreterê xwe yê giştî guhert

Li gor daxuyaniya PDK-Î ya di 20'ê Nîsanê de belavkirîye, Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê kongreya xwe ya 10'an (kongreya 50 salîya damezrandina partiyê) di navbera 12-19 Nîsanê de civandîye. Li gor daxuyaniyê, kongre di atmosferê demokratîk de çêbûye û hemû pîrsên welêt û partiyê hatine munaqesekirin.

Di civîna komîteya merkezi ya nû de Ebdulla Hesenazade ji bo sekretêriya partiyê hatiye hilbijartin û ev biryar ji aliyê sekretêrê berê Mustefa Hicrî ve ji bo nûnerên kongreyê hatiye aşkerakirin. Sekretêrê berê Mustefa Hicrî jî wek çîgirê Sekretêr hatiye hilbijartin.



The Kurdish Museum

Pêşangeha Muzexaneyê Kurdî

Muzexaneyê Kurdî li New Yorkê di navbera 25'ê Gulanê û 30'yê Hezîranê de bi navê Kurdish Headdress and A Kurdish Woman's Life (Serpûşên Kurdî û Jiyana Jinên Kurd) pêşangehek amade kirîye. Di vê pêşangehê de gelek nimûneyên serpûşên Kurdî û hin portre û wêneyên ji jiyana jinên Kurd tîne raxistin. Hin dezgehên resmî yê li bajarê New Yorkê jî piştigirîya vî pêşangehê dikin.

Adresa Muzexaneyê Kurdî:
The Kurdish Library and Museum
345 Park Place
Brooklyn, New York 11238

Kurd di navbera Anqere û Tahranê de

Îran jî navberiya Kurdan dike. Li dû ku Tirkîyeyê hewl da, da ku şerê di navbera hêzên PDK û YNK'ê de bide rawestandî, Îran jî nuha jî haliyê xwe de hewl dide ku serokên van herdu partiyên bigihîne peymaneke aştiyê. Armanca Tirkîyeyê ya lihevvanîna Kurdan ew e ku li herêma başûrê Kurdistanê otîrîteyek hebe, ku li gel Tirkîyeyê dost bimîne û herêmê jî çekdarên PKK'ê re girtî bihêle. Li milê din, Îran dizane ku bêyî Kurdan û bêyî herêma Kurdî, muxalefeta Îraqê, dê bibe muxalefeteke bêyî hêz. Ji ber ku rêxistinên şîyan jî di muxalefete de ne û peywendîya wan li gel Kurdan ne xirab e, ji berjewendîya Îranê ye, ku hewl bide da ku peywendiyên xwe li gel Kurdan baş bin.

Di çend mehên bûrî de, YNK'ê bi xwe ji carekê bêtir diyar kir ku peywendiyên PDK'ê yên baş li gel Tehranê û Enqerêyê hene. Bi encama şer, û da ku pêşbirriyê li PDK'ê bigre, YNK'ê jî dest bi hewldana baştirkirina peywendiyên xwe li gel Tehranê û Enqerêyê kir; heta birêz Celal Talebanî di hevpeyvînek li gel rojnameya EL-Hayat de ji Tirkîyeyê daxwaz kir ku bila li gel herdu partiyên Kurdistanê Îraqê wek hev bide û bistîne. Li gor Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, YNK'ê, da ku xwe nêzikî Tehranê bike û rejîma Îranî razî bike, radyoya Partiyê bi zorê daye rawestandî. İşare-

tên li holê diyar dikan ku YNK nuha hewl dide Tirkîyeyê jî rajî bike. Birêz Celal Talebanî di hevpeyvîna xwe ya dawîn de, wek "birayên me yên Tirk" behsa Tirkîyê dike û her weha behsa yekîtiya Komara Tirkîyeyê dike.

Aşkere ye, ku hem Îran, hem jî Tirkîye, li gor şertên xwe, û ji bo berjewendiyên xwe dixwazin herdu hêzên başûr têxin bin bandora xwe, yan jî bi kêmasî dost bihêlin. Ji aliyekî din de, Tirkîye û Îran, wekî du hêwîyan, her yek ji wan dê her hewl bide ku herêmê bêtir nêzikî xwe bihêle. Li gor realîte û agahdariyên li holê, Kurdên Başûr neçar in ku li gel Tirkîyeyê peywendiyê baş bihêlin. Wekî raporeke A.F.P. diyar dike; yekem Tirkîye dikare deriyê Xabûrê bigre. Ev yeka hanê, dê ne tenê xwarinê bibirre, lê herweha dê PDK'ê ji 100 000 dolarên Amerîkî, yên ku her roj ji kamyonên ku tên û diçin Tirkîyeyê digre meh-



Neynik

Şahîne B. Soreklî

rûm bihêle. Ji xwe li gor YNK'ê, ev girîngtirîn sedema şerê di navbera herdu hêzan de ye. YNK naxwaze ji vî xêrê bêpar bimîne; û eger ma jî, naxwaze ev serweta hanê têkeve berîka PDK'ê. Duwem: Tirkîye dikare rê li Hêza Çakûç ku Kurdên Başûr ji hêzên Îraqê diparêze, bigre. Di meha heziranê de pîrsa mayîna vî hêzê dê cardin di parlamentoya Tirkîyeyê de têkeve munaqeseyê. Ji ber ku mayîna vî hêzê, ji bo bêhêzhiştina Îraqê, ji bo DYA'yê jî pîr girîng e. Ne dût e ku bêtir ji bo xatîrê vî yekê DYA neçar mabe, ku piştgiriya dagîrkirina başûrê Kurdistanê bike, ku Tirkîye dibêje, amanca wê tunekirina kampên şeravanên PKK'ê ye.

Wisa diyar e, ku gelşên di navbera YNK û PDK'ê de hewqas kûr in, ku heta DYA û Tirkîyeyê jî nikaribûn vî şerê di navbera wan de bidin rawestandî. Nuha Îran hewl dide, lê PDK'ê ji bo Tehranê jî diyar kiriye, ku berî ku ew li gel YNK'ê têkeve guftûgoyan, divê hêzên YNK'ê ji Hewlêrê derkevin.

Bi kurtî, dîroka Kurdan her xwe tîrî dîke. Ji aliyekî de şertên jeopolîtîk yên dij-

war, ji aliyê din de, wekî rêber û serdarîna Kurdan bi xwe dibêjin (wek mînak, Birêz Kemal Burkay, di hevpeyvîna li gel beşê bi zimanê Kurdî yê Radyoya SBS-Australya de: 15/4/95). nebûna tecrûbeyên demokratîk di nav rêxistinên Kurdan de; ji aliyekî de pêknehatina berbipêşçûna hemdemî; û li aliyê din, nebûna tifaq û yekîtiyê netewî sedema vî yekê ye.

Heye ku gotina Kurdan, ku ji bo wan li cihanê dost nîn in, berî demekê rast bûya, lê îspatên ku îro li pêş çavan in diyar dikan, ku li cihanê, bi taybetî li Ewrûpayê, sampatiyê mezî ji bo gelê Kurd heye. Rastî ew e ku rêxistinên mafên mirovan, rêxistinên cihanî yên alîkariyê û heta welatên rojava bi xwe jî di çend salên borî de alîkariya ji bo Kurdan pêşkêş kirine ji bo geline din pêşkêş nekirine, lê wisa diyar e ku rêxistinên îro Kurdan temsîl dikan nizanin, yan nikarin, yan naxwazin vî fersenda li holê li gor realîteya îroyîn bi kar binin. Wekî dostîna Kurdan dibêjin, ne tenê stemkariya li hember Kurdan ya li holê, lê mixabin, siyaseta rêxistinên Kurdan û nebûna tifaqêke bi rêk û pêk jî di berdewamkirina trajediya gelê Kurd de roleke mezî dilîzin.

Nûçe

Konferans

Li Kurdistanê hişyariya îslamî

Di 27'ê meha Gulanê de li Almaniya, li bajarê Kolnê, di bin navê "Li Kurdistanê hişyariya îslamî" de konferansek hate lidarxistin. Ev konferans ji aliyê PİK (Partiya Îslamî ya Kurdistanê) ve hatibû amadekirin. Di vî konferansê de gelek kes wek; Prof. Gabûrî, Şêx Osman, Melik Firat, Fehmî Huweydî, Alî Bûlaç, Altan Tan, Sabah Kara û Abdurrahman Dilipak beşdar bûn.

Konferansa Ahmedê Xanî

Bi munasebeta 300 saliya nivîsandina esera Ahmedê Xanî "Mem û Zînê" li Stokholmê ji aliyê Komeleya Nivîskarên Kurd û Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê konferansek hat organîzekirin. Konferans di 27'ê Gulanê de li salona ABF'ê çêbû û gelek kes di konferansê de beşdar bûn.

Kurdologa Fransî Prof. Joyce Blau, Kurdologê Hollandî Martîn Van Bruinnessen û nivîskarê Kurd Mûrad Ciwan wek axaftvan beşdarê vî konferansê bûn.

Prof. Joyce Blau li ser jiyana Ahmedê Xanî, Martîn Van Bruinnessen li ser nasjonalîzma wî û Mûrad Ciwan jî li ser dewra Ahmedê Xanî axaftin.

Swêd: Kongreya 14'mîn a Federasyonê

Di bin şîra "Ji bo Federasyonê çalak û xurtir" de, di 20-21'ê Gulanê de li Stokholmê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê kongreya xwe ya 14'emîn li dar xist. Ji 40 komeleyên endam 209 nûnerên hilbijartî ku ji wan 118 kes di kongreyê de beşdar bûbûn du rojan li ser du salên xebatên Federasyonê rawestiyên, munaqeseyên durrûdirêj li ser rapora Komîteya Giştî ku hatibû pêşkêşkirin, kirin, hin biryar stendin, di destûrê de hinek guhartin çêkirin û organên xwe yên nû hilbijartin.

Di kongreya 14'emîn a Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê de, Sekreterê berê yê Partiya Komînist a Îraqê Ezîz Muhemed, Serokê Navenda Lêkolînên Kurdî li Moskovayê Şakîrê Xudo



Mihoyan û Dr. Beşîr Resûl Seroka Karmendên Belediyeyan li Tirkîyê Vicdan Baykara û nûnerên partiyên Kurdistanê jî hazir bûn.

Di Kongreya 14'mîn a

FKKS de ji bo Komîteya Karger ev kes hatin hilbijartin. Mustafa Aydogan, Husamettin Aslan, Şermîn Bozarlan, Ahmed Karamûs, Nebî Bal, Dilêr Berzencî, Helale Qazî. Komîteya Giştî û Komîteya

Karger di cîvîna xwe ya 4'ê Heziranê de Mustafa Aydogan ji bo serokatiya Federasyonê hilbijart. Şermîn Bozarlan bû cîgira serok û Husamettin Aslan jî bu sekreter.

10 saliya zarokxaneya Kurdî hat pîrozkirin

Yekîtiya Jinên Kurdistanê li Swêdê, roja 13'yê Gulanê de li Stokholmê 10 saliya damezrandina zarokxaneya (kreşdagis) Kurdî bi şeva-hengekê pîroz kir. Di vî şevê de karmend û zarokên vî zarokxaneyê bi hev re govend girtin û tiyatroyek kurt pêşkêşî temaşevanan kirin.

Ev zarokxaneya Kurdî cara yekem li Ewrûpayê, li paytexta Swêdê, Stokholmê hatibû vekirin û wê demê dewleta Tirkîyeyê jî girtina vî zarokxaneyê çî ji destê wê hatibû kiribû lê nikaribû bida girtin.

Di nava van deh salan de gelek zarokên Kurd li vî zarokxaneyê mezî bûn.



Katjimêra bîolojîk

Jiyana mirovî ya hundurî, ya ku laş û mêjiyê mirov di hundurê laş de tê re derbas dibin hê jî kûr veşartî ne. Katjimêra bîolojîk ya laşê mirovî yek ji wan tiştên bi piranî hê nependî ye û zane bi ser her tiştî ve nebûne. Lê li gor banê zanîna îro û lêkolînên zanistî hîpotêz (gomanên zanistî) hatine danîn. Di wan lêkolînan de kêlik bi kêlik seet bi seet diyarîkin, bê çî di laşê mirov de dibe. Helbet bêguman wê di pêserojê de ew tiştên veşartî jî hin bi hin bîn vedîtin. Lê niha zanîna mirovî gihaye çî pêpelûkê, emê ji we re pêşkêş bikin, tevî ko ew hinek ji tevayîyê ye:

Seet yek (piştî nivê şevê)

Di vî çaxî de bêhtirên mirovan berî sê seetan razane û hemû fazên (nore, xul, dewre) xewê derbas bûne. Di vî seetê de xewa mirovî sivik dibe û bi hêsanî ji xewê şiyar dibe. Eger kesek nexweş be, yan jî birîndar be di vî demê de gelekî bi êşê dihese, ji ber vî yekê, yê hawîrdorî nexweş û birîndaran gerek e bêhna xwe ji kaz-kaz û nalînên wan re ferah bikin.

Seet dido

Bêhtirên organên laşê mirovî bi eborî kar dikin, lê bi tenê kezêba reş (cerg) sûtê jî vî dema hedinî dibîne û maddeyên ji organizmayê (laş) re gerek in diafirîne û hemû jehran ji organizmayê davêje. Em dikarin bibêjin, ku laş ji hundur ve tê şuştin. Eger hûn hîn di vî demê de şiyar bin, ev ji we re tiştêkî nebaş e. Jixwe vexwarina qehwê, çayê û nemaze meyê (alkol) ji binî karekî nesewdanî (aqilmendî) ye. Eger hûn şiyar bin û dixwazin tiştêkî vexwin ji piyalek avê, yan jî şîr çêtir nîne.

Seet sisê

Di vî demê de laş xwe rehet dibe û jî aliyê fizîkî ve bi carekê de kerixî ye. Eger pêwîst be di vî çaxê dereng de hûn şiyar bin, dive hûn hemû haya xwe bidin karê ku hûn dikin û çavê xwe belkin, ji ber ko şiyarbûna we ne li gor katjimêra bîolojîyê ye, lê li gor katjimêra laşê we ye. Di vî demê de pestoya (fişar, zixt) xwîna mirovî gelekî nizim dibe û dilkutk (lêdana dil) û bêhnkişandin gelekî hêdî ne.

Seet çar

Pestoya xwîna hê nizm e û xwîna ku digihêje mêji di nizimtirîn fazê de ye. Di vî seetê de goristan himbêza xwe divekin û piraniya mirovan dimirin. Mixabin mirov nikare xwe di ser vî seetê re çend bike. Laş bi kêmîrîn enerjîyê (taqet) kar dibe, lê bihîstin(guh) tûj dibe. Mirov pêneke çiqasî nizim be jî bike, şiyar dibe.

Seet pênc

Di vî demê de herdu gurçîk rawestayî ne û tu tiştî (mîzê) navêjin. Mirovên razayî ev çend car in di hemû fazên xewê re derbas bûne. Fazên xewê jî ev in: xewa sivik, xewa xewnan û xewa giran ya bê xewn. Eger di vî demê de mirov şiyar bibe, bi hêsanî dikare ji nav nivnan derkeve, ne bi mêkutan û mirov jêhatî ye.

Seet şeş

Di vî demê de pestoya xwîna bilind dibe, dil xurt lêdixe û xwîn di sordamaran de bi hêz dijene. Eger em bixwazin hê jî razin jî, lê laşê me şiyar dibe.

Seet hevt

Xweparastina laşî (îmunolojîya) bi taybetî xurt e. Eger di vî demê de mirov bihingive vîrus û baktêriyan jî, di seerfenda, ko mirov nexweş nekeve gelekî bilind e.

Seet heşt

Di vî demê de laş rehet bûye. Kezêba reş, laş jî maddeyên jehrî paqij kiriye. Di vî demê de vexwarina meyê tiştêkî pir nesaxlem e û ji kezêba reş re barekî pîr giran e.

Seet neh

Ji seet neh ve çalakiya psîko-lojîyê bilind dibe û hisandina bi êşê nizim dibe. Dil bi hemû hêza xwe kar dibe.

Seet deh

Çalakiya laşê hê bilindtir dibe. Mirov di baştirîn forma sportî de ye. Mirov di vî demê de dikare tiştên mezin bike û ev gengazî(imkaniyat) heta firavîna dimînin. Ji ber vî yekê gerek e di vî demê de mirov ji

tiştên giran û asê re li çareyan bigere. Yê ku li çayxaneyan rûdinin, bi pelikan dileyên û yê bi hogirên xwe re li ser tiştên kelevajî dipeyivin, hêzên xwe yê giranbiha pûç û vala dibêrin. Ev hêz dê pişt re ji wan re pêwîst bin, lê hew bi dest wan dikevin.

Seet yazdeh

Dil hê jî bi awayekî ritmî li gor çelengiya mirov ya psîkolojîk kar dibe. Dil bi mezinkirin û çetinkirina kar nahese.

Seet duwazdeh

Çêlika civandina hemû hêza mirovî tê. Xebînet e niha mirov zikê xwe bide ber xwarinê. Baştir e mirov firavîna hê seeteke din dereng bixe.

Seet sêzdeh (yekê piştî nivro)

Kezêba reş xwe rehet dibe û hinek glîkoz dikeve nav xwînê. Dema çalakiya mirovî ya pêşî buhîr. Mirov bi westanê dihese û eger hê kar li pêşiyê hebe jî, rehetbûn jê re pêwîst e.

Seet çardeh

Di vî demê de enerjîya laşê mirovî gelekî nizim dibe. Di vî noreya(faza) bîst-ûçarseetî de ev nizimbûna enerjîya laşî ya diduwa ye. Reaksiyona mirovî gelekî sist û hêdî ye.

Seet pazdeh

Rewşa mirovî hinekî baştir dibe. Her pênc hesteyên(hevas) mirovî: dîtîn, bihîstin, bêhnkirin, hingivtin û çestîn(tamkirin) tûj dibin. Kurtîlhez di vî demê de hez ji rûniştina ber masê dikin. Ji nû ve hêza mirovî lê vedigere.

Seet şazdeh

Banê şekir di xwînê de bilind dibe. Hin doktor jî vî demê re dibêjin dema diabetê (nexweşiya şekir), ya piştî nivroyî. Piştî vegera hêza mirov ew dîsa hinekî kêm dibe.

Seet hivdeh

Gengaziyên karkirinê bilind dibin. Sportvan xwe li gor hêza xwe şino dikin (temrîn dikin).

Seet hijdeh

Hisandina bi êşa fizîkî kêm dibe. Daxwaza mirovî, ku li ser xwe bigere û xwe bilebitîne bilind dibe. Zelaliya psîkolojîk nizim dibe.

Seet nozdeh

Pestoya xwînê bilind dibe. Aramiya (stabilîteya) psîko-lojîyê digihêje sifirê. Mirov esebî ye û dikare ji bona tiştêkî pûç pevçûneke mezin derbixe. Ji boyên ku hîstêriya bi wan re heye, ev demê ne xweş e. Êşa serî dest pê dibe.

Seet bîst

Di vî demê de giraniya laşê mirovî digihêje pikê (maksîmum), ne çax e ku yê qelew xwe niha biwezînin. Reaksiyona me xurt û tûj dibe. Şofêr di forma herî baş de ne. Ziyarên li ser riyên çê dibin pir kêm in.

Seet bîst û yek

Rewşa mirovî ya psîkolojîk normal e. Ev dem pir bi kêrî xwendekar û hunermendan tê, da xwendin û rola xwe serdîlbikin. Mêji dikare gelek tiştên ku nikaribû bike di mêji de embar bike.

Seet bîst û dido

Hijmara şanikên spî di xwînê de gelek dibin, di sentîmetreke kabîkî (cm3) de şûna pênc ta heşt hezar şanikan, hijmara wan digehe diwazdeh hezaran. Germbûna laş kêm dibe.

Seet bîst û sisê

Laşê mirovî xwe ji rehetiyê re amade dibe. Çaxê xewê tê, lê laş ji hundur ve xwe ji afirandinên nû re amade dibe.

Seet bîst û çar

Seeta dawî ye. Bazinê şev û rojî bîst-ûçarseetî temam dibe. Eger mirov di seet bîstûdiduyan de çûbe raza be, niha destpêdike xewnan dibîne. Ne bi tenê laş, lê mêji jî ji bona jîna roja din çalakiyên xwe nû dibe û tiştên bêkêr davêje. Roj temam bû.

Ji kovara Ctenî ya Çekî

Wergêr: Zagrosê Haco

Ma te dizanîbû?

Amadekar:
Hesen Mizgîn

Enqazên keştiyên di bin behrê de xezîneyên bêhempa ne.



Hin nimûne ji van enqazan:

1- Konvoya keştiyan ku di sala 1715` an de ji Kubayê ber bi Îspanyayê derdikevin rê nêjî Cope Canaveral li Florîdayê noqî avê dibin. Tîrmeha (Timmûza) 1993` an di van keştiyan de bi hêjayî 2 milyon dolar mucewher hat dîtin.

2- Keştiya Îspanî Nuestra Senora de Atocha ku di sala 1622` an de li rojavaya başur a Florîdayê noqî avê bûbû, di sala 1985` an de hat dîtin. Bihayê wê 300 milyon dolar e.

3- Konvoya Veracruz a Îspanî ku ji 16 keştiyan pêk hatibû di sala 1553` an de noqî avê bû. Dido ji wan hatine dîtin. Bihayê wan 1,8 milyar dolar e.

4- Keştiya Îspanî Nuestra Senora de Las Maravillas li giravên Bahamayê noqî avê bû, Bihayê wê nêzî milyarek dolare.

5- Keştiya Santissima Trinidad di sala 1711` an de noqî avê bû. Biha 400 milyon dolar e.

6- Keştiya Portekîzî Ror de La Mar di sala 1512` an de noqî avê bû. Biha di navbera 1-9 Milyar dolar e.



Problema Tirkiyeyê îdeolojiya resmî ye !

Bîlal Gorgu

Di destpêka sedsala 1900'î de dema li kolanên Stenbolê gulle hatin teqandin û xwîn hat rijandin, ev bûyer bû destpêka dawîya jiyana û dewra îdareya Împaratoriya Osmanî. Stenbol paytextê wan bû, sultanên Osmanîyan ne tenê serokê Împaratoriye bûn her weha Xalîfeyê alema Îslamî jî bûn. Wan, di demên xwe yên dawîyê de ji bo hukumdariya xwe hîn dirêj bikin dest pê kiribûn reform û guhartinan di civatê de çêbikin, lê dereng mabûn. Împaratoriya Osmanî êdî wek kalekî emrê xwe tije kirî, nikaribû li ser xwe bisekine. "Nexweş Stenbolê" êdî bi navê "East Question" ji rojeva parlamentoyên Ewrûpa-yê nedihat xwarê. Hatîn û çuyînên wan, çeyî û xirabiyên wan ne li Stenbolê dihatin qisekirin, meseleyên wan li Parisê, li Berlînê û li Londonê çareser dibûn. Tîr ji kevên carê derketibû. Hukûmdarên Osmanîyan baş famkiribûn ku rojên wan hîmartî bûn. Dewra wan êdî xelas dibû.

Fêlbaziyên Tirkan

Êdî Sultan û wezîrên wî dest bi fêlbaziyên dikirin. Ji bona ku ew xwe ji rojevê derxin dest pê kirin misilman li dijî fileyan rakirin ser lîngan. File sudcar kirin. Ew di vî fêlbaziyê de bi ser ketin, xelkên misilman kişandin aliyê xwe û gelekî zor û tade li fileyan kirin. Agir berdand malê wan û wêran kirin.

Piştî Herba Cihanê ya Yekem Osmanî hê jî dewletek mezin bûn û ew jî ketin herbe. Lê di dawîya herbê de bi hevalbendên xwe re ew jî şikestin. Dewletên ku di herbê de serketin, welatê Osmanîya dagîr kirin. Dawîya Selteneta Osmanîyan hat, lê grubek serokeskerên wan û serokên Kurdan, ev yek qebûl nekirin û li Anadolîyê û li Kurdistanê dest bi serhildanan kirin. Di wextek pîrr kin de tevgera gelek xurt ava bû û li ser mîrasa sînî ya Osmanîyan dewletek pêk anîn, parlamentoyêke nû vekirin, danûstendinên xwe ji Sultanê Osmanî û Xalîfetiye re qut kirin. Di parlamentoya nû da Tirk û Kurd temsîl dibûn û di şerê li dijî dijmin de bi hev re serketibûn. Vê hevaltiya wan pir neajot. Serokê sereskerên Tirkan Mustafa Kemal bû û fêlên wî xirab bûn. Wî Kurd xapandibûn. Nûner û berpirsiyarên Kurdan ji parlamentoyê derxistin, hin ji wan kuş-

tin û hin ji wan hepiskirin. Bi lez û bez dest bi reformê nû yên modern kirin, li aliyê din li gor dilê xwe qanûnên nû yên esasî derxistin. Behsa biratiya Kurd û Tirkan wenda bû, gotina "Kurd" ji hemû pirtûk û xarîteyan hat derxistin. Mistefa Kemal û hevalên wî nexwestin mirasa Osmanîyan bi awayekî demokratîk û tolerans bimeşînin.

Kemalizm

Bi navê "Kemalizm"ê îdeolojiyeke nû kirin bingeha dewleta xwe. Li gor îdeolojiya nû paroleya wan; yek dewlet, yek millet, yek ziman û yek partî bû.

Dewleta nû Tirkiye, millet Tirk, ziman Tirkî û Partî CHP bû. Hebuna milletên din, zimanên din, dîtinên din

ne hewce bûn. Lê Kurdan serê xwe ji Kemalîstan re danan û îcar şerê wan kirin lê mixabin 70 sal derbas bûn hîn jî Kurd şerê Kemalîzmê dikin û bi ser neketine.

Lê bi ava sîtilan aş nagere. Kemalîzmê 70 sal xwe bi zor û tadeyê ragirt.

Ew bûyerên ku berî çendekî li kolanên Stenbolê rûdan, ew guleyên ku hatin teqandin û xwîna ku hat rijandin, dişibe bûyerên berî sed salî ku destpêka dawî ya dewra Osmanîyan bû.

Dîrok tekerrur dike.

Dîrok dişa tekerrur dike. Berpirsên dewleta Tirk, elîta Kemalîst ji bona ku emrê xwe dirêj bikin, dest bi fêlbazî û lîstikên kevn kirin. Mezhebên Elewî û Sunnî berî hev dan. Lê fêlbazîya wan gelekî zû eşkere bû û derket holê. Elewî û Sunnî, çî Tirk bin û çî jî Kurd bin, dijminatîya di naberan wan de qasî xwîna hev birjînin kûr nîne. Sedemên dijminatîya wan dişa hukûmeta Tirk e. Ew bi riya diyanetê ferqê dixin naberan mezheben Îslamê û dînen din înkâr dikin, di diyanetê de rê nadin Elewîyan.

Ji bo millet şaş bikin rêç û pêçên xelet, sîcdarî û fêlbaziyên xwe wekî berê dixin hûstiyê welatên din û milletên din. Lê rûyê wan derket meydanê, îcar ji bona rûyê xwe yê reş sipî bikin bi 35 000 eskerên xwe ve

êrîş birin ser Kurdistanê Başûr, û bi 20 000 eskeran jî avêtin ser Dêrsimê. Armanca êrîşa xwe bi nêçîra "Terorîzmê" ve girê didin. Bi 35 000 eskerê regulyer tu carî kes dernakeve nêçîra "Terorîstan".

Ji bo em baştir fam bikin divê em bala xwe bidin kirinê hukûmetê. Hukûmetê li Kurdistanê Bakur herb îlan kiriyê, gundan vala dikin û dişewitînin mal û milkên wan talan dikin. Zarok, pîrek û kal tîn kuştin. Nivîskar û rojnamevanên ku li dijî îdeolojiya resmî derdikevin, wek wan nafikirin, bi riyên cuda tîn kuştin. Rojname û pirtûkên ku bi dilê wan nînin, bi zimanê Kurdî ne,

” Problema Tirkiyeyê îdeolojiya resmî ya Kemalîzmê ye ku ew wek qeydekê ketiye lingên siyasetmedarên Tirk û serokên dewletê. Îdeolojiya resmî ya Tirkan; mafê Kurdan, çand û zimanên cuda, dîn û mezhebên cuda û dîtinên cuda ji bo dewleta xwe wek talûke dibîne. Dîtin û xwestinên îdeolojiya resmî ya dewleta Tirk di bingeha xwe de li dijî pêşketin û jiyaneke demokratîk e. ”

tên qedexekirin û şewitandin. Dîn û mezhebên cuda nayên qebûlkirin, zordarî û tade li ser karker û gundiyên ku heqê keda xwe dikin berdewam e. Êrîşên li dijî cîranên xwe, îşgala Qibrîsê, êrîşa li ser Rêxistinên Kurdan ên Îran û Îraqê, ne bûyarên îroyîn in. Bi jiyana xwe ya 70 salî îdeolojiya Tirkiyeyê a resmî tim xwestiyê Kurdan asimilê bike, ziman û kulturên din înkâr bike û bifetîsîne. Mafên mirovî ên demokratîk tu carî nehatiye qabûlkirin. Bingeha îdeolojiya resmî "Kemalizm"ê li ser zor û tadeyê hatiye avakirin. Bi kurtî listeya gunehên Dewleta Tirkiyeyê gelekî dirêj e, bi nivîsandinê dawîya wan nayê.

Wek seydayê Cîgerxwîn digot "Hîrç 33 henekên xwe hene, hemû jî li ser hirmîyan e." Mixabin, îdeolojiya dewleta Tirkiyeyê ya resmî "Kemalizm"; yek dewlet, yek millet û yek ziman, hatiye dawîya dewra xwe êdî nikarê bi zor û tadeyê jiyana xwe bidomîne.

Problema Tirkiyeyê îdeolojiya resmî ya Kemalîzmê ye ku ew wek qeydekê ketiye lingên siyasetmedarên Tirk û serokên dewletê. Îdeolojiya resmî ya Tirkan; mafê Kurdan, çand û zimanên cuda, dîn û mezhebên cuda û dîtinên cuda ji bo dewleta xwe wek talûke dibîne. Dîtin û xwestinên îdeolojiya resmî ya dewleta Tirk di bingeha xwe de li dijî pêşketin û jiyaneke demokratîk e.

Di çavên Ewrûpiyan de

Ferqa Kurd û Tirkan

Faris Can

Rehmetiyê Mûsa Anter di bîranînên xwe de weha digot ; "Wexta em di Daweya 49'an de dihatin mahkemekirin ji Ewrûpayê jî hinek rojnamevan hatibûn da ku temaşeya mahkema me bikin. Lê wan nizanibûn em kî ne. Piştî ku hakimê mahkemê nav û nasnameya me ji me pirsî wê gavê ew rojnamevanên Ewrûpayî têgihîştin ku em Kurd in û ji bo doza Kurdî hatine girtin. Çûnkî wexta hakim ji me navên dê û bavên me pirsî, me navên dê û bavên xwe gotin; navê diya yekî **Berfê**, navê diya yekî **Koçerê**, Navê diya yekî din **Zînê** û hwd. bû. Yanî bi van navên diyên me eşkere bûbû ku em ne Tirk in, Kurd in."

Di sala 1985'an de min Kurdologê Bûlgarî **Radoy Kirastev** nas kir. Li gor ku wî digot, wî di salên 60'î de li Îraqê di balyozxaneyê (sefaretê) Bûlgarîstanê de kar kiriyê û li wir Kurd nas kirine. Kirastev ferqa Kurdan û Ereban weha îzah dikir. "Wexta cara pêşîn ez ji Baxdadê çûm herêma Kurdan min tawilê ferq kir ku li Îraqê du milletên cuda hene. Miletêkî bi egal û kirasên xwe yê dirêj, yê din jî bi şal û şapikên xwe ji hev dihatin cudakirin.

Ev herdu nimûne jî di salên 60'î de qewimîne û nişan didin ku Kurd ji taybetiyên xwe yê neteweyî ji Ereb û Tirkan cûda dibin. Ev cudabûn hîn jî hene; nuha îro jî kesek biyanî biçe Kurdistanê Başûr dê di tawilê ferq bike ku Kurd bi taybetiyên xwe yê neteweyî ji Ereban cûdatir in. Ev bi şikleki giştî him di lixwekirina cilan de him jî bi axaftina xwe ya Kurdî de weha ye.

Lê li Kurdistanê Tirkiyeyê ev cudabûna ku li Kurdistanê Îraqê heye tuneye. Çerxa asimilasyona dewleta Tirkiyeyê û înkarkirina Kurdan û ji aliyê din jî bi pêşketina kapitalîzmê Kurd him ji taybetiyên xwe yê neteweyî bêpar man û him jî zimanê xwe ji bîr kirin. Şovenîzm û nasyonalîzma Tirkan û propagandaya dewletê ya nijadperestî tesîrek mezin li ser hîs û manewiyeta Kurdan hiştiye. Bi vî tesîrê Kurd ji taybetiyên xwe yê neteweyî dûr ketin. Cilên Kurdî lixwekirin û Kurdîaxavtin wek sembola paşdemayîne hat nişan dan. Kurd di salên 60'î de di nav xwe de qayîş kişandin ka kî dê xweş Tirkî biaxive.

Li gel ku îro şiyarbûna neteweyî li Kurdistanê Bakur geş bûye jî, lê mixabin ev şiyarbûn bê xwîn û bê goşt e. Tu hewldaneke berbiçav di nav millet de tuneye ku ew xwedî li zimanê xwe derkevin û di jiyana rojane de bi Kurdî biaxivin. Herçiqaş di salên dawîyê de di nav civata Kurd de navên Kurdî belav bûn jî, lê piştî ku ziman Tirkî be û şûra neteweyî kêm be yan jî tunebe ev navên Kurdî ji bo şexsiyeteke Kurd zêde tişteki ifade nake. Ji ber ku şûra neteweyî bi navekî Kurdî tenê dest pê dike lê bi temamî ava nake.

Ango berî 30 salan Ewrûpiyan bi navê diyên me ferqa me ji Tirkan dikirin. îro jî dê bi navê zarokên me ferqa me ji wan bikin. Yanî di van 30'î salên dawîyê de guhertineke berbiçav di warê Kurdayetiye de çênebûye, bilekî zarokên Kurd ber bi asimilasyoneke xeter ve diçin. Ya herî xerab ew e ku pêşketina komînikasyonê û şexsikirina kanalên televizyonê dibin wasitên asimilasyonê. Ew zimanê ku civata me bi paşdemayîna xwe heta nuha parastiyê, dibe ku bi pêşketina komînikasyona pîralî em di nav 10-15 salan de wenda bikin. Wendabûna wê destpêka wendabûna neteweyî me ye. Geşbûn û girsbûna tevgera Kurdî vî rastiyê naguherîne. Heta yê ku îro li Kurdistanê Bakur şerê çekdariyê dikin jî zimanê wan yê resmî Tirkî ye.

Ferqa me û Tirkan di çavên Ewrûpiyan de tuneye. Bi şikleki giştî him Tirk û him jî Kurd misilman in. Çiqaş camî li Anqerê hebin hewqas jî li Diyarbekirê hene. Di civata herdu milletan de mezheb hene, Elewîyên wan û yê me hene. Piraniya wan Sunnî, piraniya nufûsa me jî Sunnî ne. Di hundirê herdu milletan de, wek eqelîyet milletên din û dînen wan yê cûda hene. Kurd û Tirk di warê fîzyolojîk de jî bi nuansên pir biçûk ji hev tîn cudakirin, yek spî yê din ne reş e. Wê gavê bi şiklê giştî ku yekî biyanî ferqa me ji Tirkan bike dê ew jî ferqa ziman û kultura me be. Ev cudabûn ku di jiyana me de bê bikaranîn de tesîreke mezin li ser hîs û şûra Kurdan bike û bi vî hawî yekî Kurd dê bi serbilindî xwe ji yekî Tirk cûda bike.

Wê rojê ez li metroyê rastî yekî Swêdî hatim. Ew wek turîst par çûbû Tirkiyeyê. Li gor ku wî digot; "Ew li Antalya'yê li restorantekê rastî Kurdekî servîtor hatiye ku muamela wî gelek baş bûye. Li ser vî muameleya wî yê Swêdî meraq kiriyê û pirsîye ka ew çî kes e. Wî gotiye ez Kurd im, lê Kurdî nizanîm."

Serokê Enstituya Kurd a Parîsê Kendal Nezan:

”Gelê ku ji alî mêjî ve beleng zû bi zû nikare zincîrên bin

Xwendevanên Hêja! Armançê bi Serokê Enstituya Kurd a Parîsê Kendal Nezan re li ser jiyana wî, Enstituya Parîsê û baweriyên wî yên li ser xebata Kurdan hevpeyvînek çêkir. Kendal Nezan xwest bersiva pirsên me bi nivîskî bide.

Armanç: Bi kurtî be jî ,tu dikarî qala jiyana xwe ya heta ku tu derketî Ewrûpayê, qala jiyana xwe ya li welêt bikî ?

Kendal Nezan: Ez heta 17 saliya xwe li Kurdistanê bûm. Piştî temamkirina xwendina navîn li lîseyê Dîyarbekirê, çûm Enqerê bi qasî du salan min li wir li Zanîngeha Hacetepeyê bijîşkî xwend. Paşê ji bo xwendina xwe hatim Fransayê. Min li zanîngeha Parîsê pêşî mîhendîsiya fizîka atomî xwend, dûre jî li ser fizîka nukleer doktora çêkir û min xwe da xebata zanistî û lêgerînê.

Armanç: Heta damezirandina Enstituya Kurd li Parîsê, di warê demokratîk û siyasî de çi xebatên te çêbûne?

Kendal Nezan: Salên destpêkê wek gelek xwendekarên wê demê ez jî ketim nav tevgerên dijî şerê Vietnamê, diji apartêhdê li Afrîka Başûr, bi rêxistinên piştevanîya berxwedana demokratîk li Şîlî û Brezilyayê peywendiyên min çêbun. Di vê navê de ketim nav ronakbîr û hunermendên fransîz ên pêşverû. Di sala 1974 an de, gava ku li Kurdistana Iraqê şerê li diji Kurdan dest pê kir, me li Parîsê Komala Fransa Kurdistan danî. Di vê komelê de kesin navdar ên wekî Jean Paul Sartre, Simone de Beauvoir, Maxime rodinson, xwediyê xelatên Nobelê wekî mamosteyê min î fizîkê Alfred Kastler hebûn. Armanca vê komelê nasandina gelê Kurd, çanda wî, rewşa wî û doza wî ya ji bo jîyan û azadîyê bû. Bi arîkariya vê komelê me bi fransîzî li ser Kurdan hin pirtûk derxistin, di kovar û rojnameyan de bend û nivîsar belav kirin. Yek ji van pirtûkan, ya B. Nikitin e; yek li ser helbesta gelêrî ya Kurdî ye. Yek jî bi navê Kurd û Kurdistan bi beşdariya A. Qasimlû, I.Ş. Vanlî û min û bi pêşgotina M. Rodinson derket. Ev pirtûk bi Îngilîzî, Almanî, Japonî, Yewnanî, Erebi û Farisî derket, ji bo wê demê bû pirtûka referansê li ser Kurdan. Min di vê navê de di radyoyên Fransîzî de hin bername li ser mûzîqî û helbesta Kurdî jî belav

kirin, sêlikên muzîqîya Kurdî derxistin. Yek ji van, di kolleksiyona navdar a UNESCO'yê de derket. Hin xebatên min ên arîkarî û piştevanîyê ji bo Kurdistana Iraqê û Îranê, ji bo beledîya Dîyarbekirê bûn. Salên dirêj ên xebatê bi çend gotinan vegotin diwar e. Bi kurtî, di ber xebata xwe ya fizîkê de karê ku ji destên min hat çî ji bo Kurdan, çî jî ji bo gelên din ên ku ji bo azadîya xwe şer dikirin (Eritre, Afrîka Başûr, Çekoslovakya, û h.w.d) min kiriye.

Kovara Azadî

Armanç: Di salên 1978-1979'an de li Fransayê bi navê "Azadî" kovareke xwerû bi Kurdî derket û tu berpirsiyarê giştî yê vê kovarê bûyî. Fikra ku kovareke xwerû bi Kurdî ji ku hat?

K. Nezan: Rast e, em çend kes bi hev re, li Parîsê me ev kovara Kurdî derxist. Wê demê kovarên Kurdên Bakur hebûn, lê çî bigre hemû bi tirkî bûn. Min di destpêka salên 1970'î de demekê bi navê Ronahî jî kovareke Kurdî-Tirkî derxistibû. Piştî çend hejmaran kovar spartin hin hevalên Kurd li Almaniyayê. Vê carê me xwest ku nîşan bidin da ku meriv bi kurmancî li ser hemû pirsan, heta li ser siyaseta û marksîzmê jî binivîse; kurmanciya nivîskî pêşve bibin û belav kin û di vê navê de çend Kurdên welatparêz ên ku li Fransayê diman têxin nav karekî feydekar û hînker.

Armanç: Azadî bi naverok û sloganên xwe kovareke marksîst bû. Hetta "Manifestoya Komunîst" hatiye wergerandin bo Kurdî. Çima kovareke Marksîst û eger tu Kendal Nezanê berpirsê giştî yê Azadîyê û Kendal Nezan ê îro yê serokê Enstituyê bidî berhev, tu çi ferqan dibînî?

K. Nezan: Wê demê xwendayên Kurd hemû bawermendên Marksîzm-Lenîniizmê bûn. Ez bixwe çûbûm, di şertên diwar û xeternak de li Yekîtiya Sovyetê, li Komarên Qeqqasya û Asya Navîn heta li Sibîryayê geriyabûm û gihîştibûm wê baweriyê ku ev cureyê "sosyalîzmê" nikaribû bibûya hevî û duwaroja mirovatîyê. Min li ser vê pirsê him di rojnameyên Fransîzî de him jî di pirtûka "Kurd û Kurdistan" de, di nivîsara ser Kurdên Sovyetê,

nivîsî. Cara pêşîn min behsa rakirina Kurdan a salên 1930 û 1940'î kir, û ev bû sedemên dijîtiya gelek kes û rêxistinên Kurd ên peyrewên Sovyetê.

Bawerîya min bi Sosyalîzma Demokratîk heye


Wek şexs, danûstendinên min ên xurt bi sosyalîstên Fransa re hebûn û ez bi sosyalîzma demokratîk bawer bûm. Sosyalîzma demokratîk ji bo min edaleta sosyaleke bingehî di nav çarçewa demokrasiyêke fireh a pirdeng û serbest de ye. Marksîzm wek nêrîna cihanê, wek felsefe yek ji kaniyên se-reke yê ve sosyalîzmê ye. Lê marksîzm ne ol û mezheb e; weke hemû teoriyên zanistî berhemê demeke dîrokê ye, rastiya wê, roniya wê ta derecekê ye; rastiya mutlaq nîne. Çawa teoriyên Newton, Copernîc, Einstein û Max Planck di dîroka fizîkê de gehinek û qonaxên mezin in, marksîzm jî di zanistiyên civakî de gehîneke mezin e û ewê bandûra wê ya li ser jiyana ramanî domdar be. Di dîroka ramana nûjen de Marks û Freud du mutefekîrên mezin in, deradêtin in. Min him bi vê baweriyê him jî ji bo belavkirina termînolojîya siyasî bi

Kurmancî di her hejmareke Azadîyê de parçeyek ji manifestoyê belav dikir. Wê demê jî, wekî niha ez endamê tu parti an rêxistineke siyasî nebûm. Bawerîya min bi xebata siyasî ya dizî û îlegal nebû û tu partiyên Kurd ên ku eşkere li welat bixebitin û ez bikaribim arîkariya wan bikim jî nebû. Tenê demekê, di sala 1979'an de, piştî êrişa Xumeynî li diji Kurdên Îranê, li ser daxwaziya hevalê min î hêja rehmetî Dr. Qasimlo, heta ew bikaribin hevalekî xwe bişinin, min çend mehan "nûneriya" PDK a Îranê ya dervayî welêt kir, ji bo dengê wan bighînim raya giştî ya cihanê. Dr. Qasimlû pêşaweyekî demokrat, zane û dûrbîn bû, kurdekî îstîsnayî bû. Em hevalên hev ên nêzik bûn û ez gelek li ber kuştina wî ketim. Pîrr bê wext çû û di jiyana siyasî û fikrî ya Kurdî de ciyê wî valahiyek mezin hişt.

Niha dostaniya min û gelek şexsiyetên welatparêzên Kurd heye, lê girêdana min bi tu rêxistineke siyasî ve nîne.

Enstituya Parîsê

Armanç: Fikra damezirandina Enstituyê çawa peyda bû?



Kendal Nezan: "Divê Kurd ji mantiqa felaketî ya şerê çekdarî dest basî mantiqa şerê siyasî yê demokratîk bibin"

Kesên bingehîn yê ve xebatê kî bûn?

K. Nezan: Piştî hîlbijartinên Gulana 1981'an, hêzên çep li jêr serekîtiya F. Mitterrand li Fransayê hatin îqtîdarê. Di nav vê hikûmetê de çend wezîrên Kurddost hebûn. Ji alî siyasî ve ne konjonktura navçeyê û ya derva, ne amedebûna siyasî ya Kurdan rê nedida inisiyatîfêke siyasî ya girîng ji bo gelê Kurd. Piştî darbeya eskerî li Tirkiyê gelek ronakbîr û hunermendên Kurd hatibûn derveyî welêt. Tevî çend hevalan, me xwest vê fersendê bi kar binin û di aliyê çandî de ciyek ji bo berhevkirina arşîvên Kurdan û nasandina gelê Kurd deynin. Cihêkî serbixwe, bêalî, çandî, zanistî û Kurdîstanî. Berî mirina xwe rehmetî Mîr Kamran Bedîrxan pirtûk û arşîvên xwe spartibûn min, gotibû rojek dewlet, zanîngeh an pirtûkxaneyêke Kurdan çêbû, bispêre wan. Ev pirtûk bûn bingehê pirtûkxaneyê Enstituyê.

Di fikra danîna Enstituyê de gelek arîkariya rahmetî Yilmaz Güney jî bû. Zaneyên Kurd ên

wekî Hêjar, Cegerxwîn, Qana Kurdo, Nûredîn Zaza, Hecî Cindî, Osman Sebrî piştevan kirin; hunermend Remzî Raş ronakbîrên Kurd Ismet Şe Vanlî û Ordîxanê Celîl jî fikrî û manewî de beşdarî xebatê bûn. Nas û dostên fransîzî yê ku li dora Komala Fransa-Kurdistana civiyabûn kesên din jî arîkariya me kirin. Armanca me hemûyan danî mueseseyêke ciddî ya Kurdan paytextê çandî ya cihanê de bi arîkariya dewleta Fransayê, bo ku hebûna gelê Kurd û çanda wî bi awayekî resmî dewleteke mezin bidin qebûl kirin û Enstîtu bibe weke "sefartê teke çandî" ya Kurdan.

Armanç: Bi kurtî armanç xebatên Enstituyê çi ne?

K. Nezan: Enstîtu berî hemî tiştî, malbendeke belgwerî dokumantasyonê ye. Pirtûk, kevar rojname, belavok, wênefilm, kaset û her cure belgeyê li ser Kurd û Kurdistana, li ser ziman, edebiyat, çand û dîroka Kurdî berhev dike û wan did

Çiqas fedakar û mêrxas be jî, î û nezaniyê bişkêne”

heta lêger, xwendekar, roj-
levan û xwendeyên Kurd û
Kurd.

w piştewaniya lêgerên li ser
an, çand û dîroka Kurdî
, arîkariya lêgerên biyanî
û bi peydekirina bûrsên
indina bilind ji gelê Kurd re
royên çandî û zanistî
îne. Ta niha ji çar aliyên
distanê û ji nav Kurdên
yetistana kevn 214 xwen-
dar dane xwendin.

Armançê Enstîtuyê jî belav-
na çanda Kurdî ye, ji vê
ê ta niha bi Kurdî kasetên
îkî û filmên vîdeoyê hatine
rin û belavkirin, kovar û
ûk çap bûne, bi zimanên
nî (Fransîzî, Îngilîzî, Tirkî)
î nav weşanên Enstîtuyê de
î weşanxaneyên ewropî de
îkên li ser Kurdan hatine
kirin. Lîsta van weşanan yek
ek dayin ji çarçeva vê hev-
vîne derdikeve.

ek ji xebatên Enstîtuyê ê se-
jî karê standardîze û
irina kurmançî ye. Ji vê
ê em salê du caran, her carê
o hefteyekê pisporên ziman,
skar û rojnamevanên kurdî
î Ewrûpayê dicivînin. Enca-
î van civînan di rojnameya
ya Kurmançî de bi kurdî,
î, fransî û îngilîzî tîn belav-
n. Karê me yê ferhengê
dî-fransî jî li ber temambûnê
Hêvîya me ew e ku ferheng
ala 1996'an de temam bibe
keve çapê.

Armançê sereke ya Ens-
yê jî nasandina rewşa îroyîn
lê Kurd e, bi taybetî di warê
ên mirovî de. Ji bo vê yekê
meh bulteneke me ya agah-
î bi fransîzî, îngilîzî, almanî
spanyolî derdikeve û li 85
atan li pirtûkxaneyên mezin,
îngêh, rojname û muesseseyê-
sereke tîn belavkirin û ji bo
dibe çavkanîyeke bi pergal
ahdariyê li ser gelê Kurd. Di
arî de Enstîtu ta niha konfe-
î jî navneteweyî jî amade ki-
ji bo enternasyonalîzêkirina
a Kurdî û hin karên "lobby-
î kirine û dike ji bo çêkirina
ke giştî ya kurddost.

Armanç: Kovara "Hêvî" û
iddia Kurdîca" heta demekê
ketin û nuha dernakevin.
a?

Armanç: Em dixwazin ku
yeke bilind a van kovaran
e. Mixabin hê potansiyela
akbîrî ya me tîr nake ji bo
xistina bi pergal a van herdû
aran. Di sala 1983'an de
î çî bigre tenya kovara
arî kurdî bû. Niha kovarên
dî yên din hene. Divê Hêvî
tejiyeke nû bide pêşya xwe.

Niha berpîrsiyarê wê Reşo
Zilan li ser vê pîrsê dixebite.
Kurd di demeke ew hinde dij-
war de ne ku hewesa nivîsîn,
lêgerîn û xwendinê kêmbûye.
Ev bedbinî, bê gûman, tesîr li
ser xebatên Enstîtuyê dike.

Bûrsên Xwendinê

Armanç: Yek ji xebatên hêja
yên Enstîtuyê belavkirina bûr-
sên xwendinê ne ji bo xwen-
dakarên Kurd. Awa û şertên
muraceata bûrsê çî ne? Ew-
raqên pêwîst yên muraceatê mi-
rov çawa dikare bi dest bixe? Li
çend welatan îmkânên xwendinê
hêye?

K. Nezan: Hemû keç û xor-
tên kurd ên ku xwendina xwe
ya lîseyê temam kirine dikarin
bi name serlêdana bûrsên
xwendina bilind bikin. Divê ku
tevî nameya serlêdanê fotoko-
piya diploma xwe ya zanavna-
meya (cuzdanê) xwe bişînin.
Kesên ku notên wan bilind û
emrê wan piçûk bin, xwedî
şanseke bilindtir in, gava ku
not û emrê wek hev bin em pê-
şingiyê didin keçan. Di her
awayî de, divê ku emrê namze-
dên mezûnê lîseyê ji 25 salan,
yên xwedî lîsans yên ku dixwa-
zin doktora çêkin jî ji 30 salan
biçûktir be. Komisyona Bûrsan
a Enstîtuyê ku ji heft pisporên jî
her aliyên Kurdîstanê pêk tê, li
van serlêdanan temaşe dike û ji
wan kesên ku layiqtir dibîne
hildibjêre û dide xwendin. Niha
li 4 welatan bûrsên me yên
xwendinê hene. Em dixebitin
ku li welatên din jî bûrsan pey-
da bikin da ku bêtir kesan bidin
xwendin. Gelê me hewcê kesên
xwenda, zane û têgihiştî ye.
Zanîn karîna e. Ji alî zanîne ve
gelê Kurd li gora gelên cîran jî
paşde ye, jê kêmbûnê peyda
bûne û ên ku peyda bûne jî bi
awayekî sistematîk jî aliyên
dewletên zordest ve an hatine
entegrê kirin an qir kirin. Elît
mêjiyê gel in. Gelek jî alî mêjî
ve belagaz, çiqas fedekar û
mêrxas be jî zû bi zû nikare
zincîrên bindestî û nezaniyê bi-
şkêne, bigihê azadiya xwe.(1)

Enstîtu çima bû Weqif ?

Armanç: Şertên endametiya
Enstîtuya Kurd li Parisê çî ne?

K. Nezan: Enstîtu niha jî alî
hiqûqî ve bi biryarnameyeke
taybetî ya serekwezîrê Fransayê
wekî " weqfeke jî bo qenciya
giştî" hatiye nasîn. Komele an
partî nîne ku endamên wê he-
bin. Niha heyeteke îdarî ya wê

ya jî 15 kesan pêkhatî heye û
ewê di nav vê salê de heyeta
îdarî, ji kesên ku layiq dibîne,
Konseyê çandî û Zanistî ya
Enstîtuyê pêk bîne. Ewê di
Konseyê de şaxên ziman û ede-
biyat, zanistiyên mirovî, mûzîqî
û huner, agahdarî û mafên mi-
rov û çalakiyên civakî hebin.
Kesên ku ta niha di van waran
de bi Enstîtuyê re xebitîne an
dixwazin û dikarin xebatên wê
pêş ve bibin, dibin endamên
Konseyê.

Armanç: Enstîtuya Kurdî li
Parisê bû weqif. Struktura rêx-
istinî ya weqifan çîhetî e ji ya
komele û enstîtasyonên din.
Pêwîstiya weqifekê jî ku hat? Ji
heyeta îdarî ya Enstîtuyê li dijî
weqifbûnê reaksiyonek çêbû
yan na?

K. Nezan: Weqif di şertên
Fransayê de xwedî istiqrareke
hiqûqî û malî ya mezin in. Pîr
kêmbûna mueseese hene ku karîbûne
bi raya musbeta Şûraya Dew-
letê û bi biryarnameya sere-
wezîrê vê îmtiyazê wergirin.
Qasî ku ez pê dizanim ta niha
xeynî Enstîtuya Kurdî û Ens-
tîtuya Cîhana Erebî tu muese-
seyên Rohelatê ev îmtiyaz nes-
tandine. Pêwîstiya weqfê jî dax-
waza istiqrardana Enstîtuyê û
domdarkirina wê hat. Me
xwest ku Enstîtu bi saya we-
qifbûnê bibe xwedî budceyeke
garantîkirî ya asgarî û xwedî
statuyeke hiqûqî ya ku wê jî
talûka guherandinên siyaseta
hindurî ya Fransayê biparêze.
Her guherandin bi xwe re hin
dijîtî û reaksiyonan tîne. Loma
hin hevalên Heyeta Îdarî ya
Enstîtuyê jî di destpêkê de ne bi
vê fikrê re bûn. Lê civîna gelem-
perî ya Enstîtuyê ya Nîsana
1993'an ev proje bi temamiya
dengên kêmbûnê yek deng cardin bi
awayekî gelek demokratîk peji-
rand.

Kendal Nezan: Serokê Heta Hetayê ?

Armanç: Hinek îddia hene,
dibêjin ji bona ku Kendal
Nezan heta hetayê serok
bimîne, Enstîtu kir weqif. Anku
çî bêtir Kendal Nezan=Enstîtu,
Enstîtu= Kendal Nezan. Tu li
ser van îddiayan çî dibêji?

K. Nezan: Ez bawer nakim
ku wekî şexs hewcedariya min
bi Enstîtuyê an serektiya wê
hebe. Di demeke dijwar a
dîroka Kurdan de min pey-
wendî û îmkânên xwe yên pi-
ralî xistin xizmeta danîna mue-
seseyeke Kurdî û tevî hevalên
din tiştên ji destên min hat min

kir, ji bo domkirin û jîndariya
vê mueseseyê. Gava ku imka-
nên me rê bidin, ku kadroyên
xurt di Enstîtuyê de bi cih bibin
û ew bikaribin wê bîgerînin, ezê
bi kêfxweşî wezîfê dewrî wan
bikim. Serekê Enstîtuyê jî 3 sa-
lan carekê tê helbijartin û wê
demê em bi hev re biryar didin.
Ku min Enstîtu bê ku bigihê is-
tiqrareke tamamî di nivê rê de
bihîştta û wekî piraniya proje û
xebatên Kurdî ev jî bibûna
marê niv-kuştî û bipelîşiya, ewê
rexne û gazin gelek bêtir bûna.
Jiyana civakî bê rexne û gazin
nabe. Di dawiyê de wext û
dîrok rastiye diyar dikin, kes û
bûyeran dixin şûna wan.

Di nav berpîrsiyarên Enstî-
tuyê de heye ku navê min bêtir
bê hilanîn, lê eşkere ye ku gelek
kesên din di warên cihê yên
xebatên xwe de, berpîrsiyar in,
xizmetên hêja dikin, hin jî wan
di nav Kurdên Îran û Îraqê de
tîn nas kirin, hin di nav Kurdên
Tirkîyê de. Yê girîng xebat û
xizmeta kirî ye.

Armanç: Gazindeyeka din ji
Enstîtuyê ew e ku dibêjin ji çer-
çeweya armanç û qada xebata
xwe dûrdikeve, zêde bi siyasetê
mijûl dibe, karê partiyên siyasî
dike. Tu çî dibêji ?

K. Nezan: Du cure gazinc tîn
kirin ji Enstîtuyê. Hin kes dibê-
jin di vê dema şerê heyin û
neyîne de, di wêrankirina wela-
tê me û rakirina Kurdan de,
çima hûn hê giraniya enerjî û
xebata xwe didin pîrsên ziman,
folklor û çandê? Çima guh na-
din hawara gelê kurd, dengê wî
baştir nagihînin çîhanê? Hin
kes jî hene dibêjin çima hûn ji
xebata çandî dûr dikevin "bi
siyasat û diplomasiyê" mijûl di-
bin? Ya rastî, hê jî destpêkê ve
"nasandina pîrsa Kurdî" yek ji
pênc armançên di destûra Ens-
tîtuyê de diyarkirî ye. Li gora
dem û îmkanan me jî bo vê
amancê me hin xebat kirine,
konferans û semîner çêkirine,
beşdarên civînan navnetewî
bûne. Karê partiyên siyasî miro-
van li dora bernameyek siyasî
civandin û ji bo îqtîdarê şerê
siyasî kirine. Me ta neha karekî
wilo nekiriye. Beşdarbûna mu-
naqeseyên fikrî, agahdarkirina
raya giştî, çêkirina "lobby" li
welatê demokratîk di monopo-
la partiyan de nîne û di vî warî
de jî me rê li partiyan negirtiye
û tî nagihim ku ji me gazin bi-
kin bêjin hûn jî bo Kurdan zêde
xebitîne. Ême bi xwe, em li ber
dikevin ku di van rojên reş de
îmkânên me dest nedane ku bê-
tir bixebitin, çêtir xizmeta gelê
Kurd bikin.

Şerê çekdarî yê PKK'ê firsêteke zêrîn da dewletê

Armanç: Tu jî zû de li
Ewrûpayê dijî û te piraniya jiya-
na xwe ya li vir pêşkêşî xebata
standina mafên neteweyî û de-
mokratîk yên gelê Kurd kiriye.
Tecrûbeyê te ya şexsî çêbûye.
Bi ya te, rîya çareserkirina pîrsa
Kurd li Tirkîyê çî ye? Li ser
rewşa îro ya Kurdistanê Bakur
tu çî dibêji?

K. Nezan: Li Kurdistanê Ba-
kur siyaseta dewletê rakirin û
belavkirina Kurdan, valakirina
Kurdîstanê ye. Vê siyasetê di
sala 1932'an de dest pê kiribû û
ta şerê cihanê yê duwem hate
meşandin. Di wan salan de nêzî
sêyeka nifûsa Kurdistanê hate
vala kirin û belavkirin. Lê ji ber
sedemên taybetî yên salên şerê
cihanî ev siyaseta hate rawestan-
din. Li Tirkîyê xwedî dewletê
cîhaza kemalist a leşkerî û polisî
ye. Projeya wan a stratejîk ew e
ku piştî qirkirina Ermeniyana di
sala 1915'an de û derxistina
milyon û du sed hezar Rûmên
Anadolîyê di salên 1920'an de
gelê ne tirk ê dawîn ê girîng ê vî
welatî, ango Kurdan jî gundên
bav û kalên wan dûr bixin, li
nav Tirkîyê belav bikin û bi-
mehînin, pîrsa kurdî tîxin pîrsa
hindekahîyeke bê erd û bi çend
mafên çandî yên sivik xwe jê bi-
fîltînin, integrasyona netewî ya
Tirkîyê temam bikin. Şerê çek-
darî yê PKK'ê fersendek zêrîn
da dewletê jî bo bicihanîna vê
projeya stratejîk û pûçandina
potansiyela demokratîk a
Kurdî. Lê îro êdî tîr ji kevanê
derketiye, gelê me û welatê me
çar alî di nav agir de ye. Feyda
hefî û gazincan nîne. Jiyana ne
tiyatroyê ye ku em bêjin "me cara
pêşîn xelî kir, rola xwe baş
neleyist, emê vê carê baştir
bileyizin". Kurd êdî wekî gelekî
li Kurdistanê Bakur ketine şerê
heyin û neyîne. Loma divê ku
amanc sereke ya hemû welat-
parêzên Kurd ew be ku vî şerî
bidin rawestandî. Pêşî li koça
Kurdan û valakirina Kurdistanê
bigrin, ji mantiqa felaketî ya
şerê çekdarî derbasî mantiqa
şerê siyasî yê demokratîk bibin,
alternatîfeke demokratîk bidin
peyda kirin. Kurd dikarin di
hemû waran de xurt bin, rejima
tirk îzole bikin û meşrûiyeta
doza xwe bi raya giştî ya cihanê
bidin qebûl kirin, ji bilî warê
şerê çekdarî.

(1) Institut Kurde- 106 rue La
Fayette- 75010 PARIS
Tel: +33-1-48246464
Faks: +33-1-47709904

Nameyek ji bo yara bedew

"Dilê min liyan e, liyan e derman lê nayên"

Evîna min;
Bi hesreta te li kolanên xerîbiyê, bêhiş û bêhêvî dinalim. Hesret û evîna te, min roj bi roj dihelîne, ez gav bi gav dikalim; di xortaniya xwe de dibim mîna kalekî 70 salî. Dûrbûn û bendewariya te, dest û milên min qut dike û disoje. Gazin û fizarên te, dil û hinavên min, mîna yên jahrikirî, pûç û ziwa dike. Bindestî û şerpezetiya te, qehr û xezeba dilê min, her roj zêdetir dike; jiyana bêyî te, min serberdayî, bêarmanc û hêvîşkestî dike.

Delala min;
Dilê min liyan e, liyan e derman lê nayên. Ez bêyî te, wek masiyê jahrixwarî û serxweşê qidûmşikesî bû me. Jiyana min, wek jiyana Berhîmê dojederê ye; lew laşê min dişewite. Bendewarî, sitûxwarî û dilsojî, min dibe cem Memê Alan, evîndarê Zîna Zêdan. Di xewn û xeyalan de jî Bekoyê Ewan, mîna marekî bejindirêj û tevî zimanê bijahrî ku li hêviya qurbanî xwe telandî ye, tê ber çavên min.

Ez ditirsim hêviya min; ez ditirsim ku careke din te nebînim. Gelo heye ku ez careke din çav bi wan biskên badayî, çavên reş û belek, bejna zirav û dirêj, mîna taya rihanê bikevim? Heye ku em careke din dest bi dest, li ber qerxê Dicle û Feratê, li dora Şîpanê Xelatê, li deşta Mûş, Herran û Batmanê bigerin? Heye ku ez dest bavêjim noqa te û dev û lêvan tîxim gerdena te yî sipî? Heye ku em dîsa bi firê bikevin û di ser axa bav û kalan de, li Hezarê, Gola Wanê û çiyayê Araratê binêrin? Ez ditirsim delala min; ez dixofim ku ew roj ketûbin bin ewrên reş û tarî. Ez ditirsim ku ba, bahoz û teyrokên bişid bi ser de werin.

Yara bedew;
Tê bîra te, em li ber qeraxê gola Wanê, li ser mîrga nerm rûniştûbûn, me li çivîkên beravî û keşiyên ser deryayê temaşê dikir? Çemê Dicleyê û Deriyê Mêrdîne tîn bîra te? Kela Dimdimê û sêvên Meletê? Ava Bedlîsê? Mêrgahmed û çemê Feratê? Te jî bîr nekiriye ku em dest bi dest, di bin siya darên bejînbilind de, di nav gul û çiçekên rengîn de, ber bi bihiştê ve diçûn? Ma tê bîra te, em di bin peşkên baranê de çûn binê dara hejîrê û ketin kêf û henekan? Di bin tarî û zilûmatê de, dema şîrçe-şîrqa birûskan, gürme-gur-

ma ewran û xure-xura teyrokê bû, em derbasî baxçeyê İremê bûbûn?

Xezala min;
Ez bi evîna xwe, mîna Memê Alan, bi hesreta xwe mîna Feqiyê Teyran, bi sebir û sebata xwe mîna Melayê Cizîrî, bi xof û hey-beta xwe mîna Gêwê Guherz û Kawayê hesinker li benda te me. Li hêviya te me ku rojek bê, em careke din hev bibînin, hev himêz bikin û dîsa tîkevin kêf û henekan. Li benda wê me ku Bekoyê Ewan bicehime û Dehakê sitemkar bi jahriya xwe ve tîkeve bin axê! Hêvî dikim dilê min, hêvî dikim ku çepelê Beko û Dehak di xwîn û çepeliya xwe de bifetisin; lew careke din bi xwe ve neyên!

Tu yî, ya di hiş û xeyalên min de. Tenê li te difikirim û li ser te dinalim. Hiş û mejiyê min, bi hebûna te bi sebr û hedan e; xwîna min, bi hêviyên vejandina te dikele û di damaran de diherike. Çavên min, bi baweriyên hevdiîtîne mîna mercanên binê ava zelal diçirsin. Dilê min, mîna alavên çiyayê Agirî bi hesreta ramûsanî dikele, dipijiqe û di nav geliyên bêserî û bêbinî de, mîna şîrşaran diherike. Û di quntara Agirî de jî, li hêlekê gul û sosin, li hêla din jî nêrgiz, pîr-pîzêk û çiçekên rengîn, bi hesreta dilên evîndaran şîn dibin, derdik-evin ser rûyê erdê.

Evîna min;
Bax û baxistan, gul û gulistan, dar û daristan tev ji bo te şîn dibin. Bihar ji bo te tî û Newroz jî ji bo rûmeta te tî pîrozkirin. Siyabend ji bo te, li ser Xecê di-



nale, Mem di çavên te de evîndarê Zîne ye. Xanî li ser te dilniyên xwe tîne zimên û Şivan bi dengê xwe yî zîz, ji bo te distirê. Wan û Hezar ji xwîna te sor bûne, Ferat û Dicle ji rengê xwîna te diherikin. Şîpan û Cûdî, ji ber hesreta te berf û bahozê, kevir û kuçikan li ser xwe dibarînin.

Hesreta min;
Bi wan çavên reş û birûyên qeytankirî, careke din binêre li min. Serî hilde û rabe ser xwe; da ez bejn û bala te ya wek tayê rihanê zirav bibînim! Mêzeke li min; bibîne ez ji hesret û evîna te, di çi halî de me! Bi lêvên xwe yên sor, bibişive ji min re; bibişive ku careke din hinarikên rûyê te, bîn ber çavên min Çavên belek, biskên badayî û dêm û xalên rûyan... Bibihîze hewar û gaziye min! Guh bide dilniyên min; evîn û hesreta min.

Şoxa min;
Tu mîna sitêrên li esmana yî; şewq û şemala te, bi şev mîna heyvê û bi roj jî mîna tavê, ruhî dide dora xwe. Ez jî mîna peykerê te, li gor şewqa te geş dibim. Gava ronîya te geş dibe, ez jî mîna sitêrên li dora te kêfxweş û dilşa dibim, dema ruhniya te kêf dibe, ez di berf û bahozan de, mîna gul û sosinê neavdayî, melûl dibim û diçilmisim. Lê namirim, lew li benda şewqa te me; bi hêviyên jî nuh ve derketina şewqa te, bi xeyalên jî nuh ve hevdiîtîne dijîm.

Delala min;
Di şevên tarî de, dema bayê êvarê, ez gilî û gazinên te di-bihîzim. Dengê nalînên te yên zîz û zelal, bi bayê êvarê re bîden-giyê dişikîne û hissên çavniyê digihîjîne nik min. Di şevên sayî de, sitêr bi gewheriyên xwe û heyv jî bi çirîskên ronahiya xwe, sitanên evîndariya te ji min re rêdikin. Di berf û bahozan de, di şevên dûr û dirêj de, ricifandin, lerizin û giryanên te tîn ber çavên min. Bi deng û ruhniya birûskan re, çelengiya hewildanên bêwestan ên rizgariya ji sitemkariyê dikevin xeyalên min. Ewrên reş û tarî bi ser te ve xwar bûne, ew haziriya êrişên dijwar dikin. Lew pêwîst e, tu wan bi-bihîzî û bibînî!

Ez sond dixwum yara min, sond dixwum ta ev ruh û giyan di vî laşî de hebin, ta ku xwîna min î sor di damaran de biherike, ta ku hiş li serê min be, ta ku bi-bihîzim û seh bikim, ta ku hîs bikim, bibînim û biaxifim, tu dê her di bîra min de bî! Tu dê di hiş, mejî û di xwîna min de bî! Her perçeyê laşê min, ruh û mejiyê min, dê giyanê te bin! Ne ewrên reş û tarî, ne jî bahoz û teyrok nikarin min ji te dûr bixin û me ji hev biqetînin! Lew ez ji bo te heme, ji bo te dijîm û ez dê ji bo te bimrim!

Mehemed Dehsîwar

Kurdên kelaşan

Azad Ehmed Elî

Gelî Kurdan razên. Çekan bavêjin. Alaya sipî hildin jor:

Mêr ji me re navên, şêr ji me re navên, çek ji me re navên, serok ji me re navên, hejmarên yekê ji ferhenga miletê me re navên..

Bi raste gelî Kurdan razên!
Sirûdên hişyariyê bes in, em ji rengên alayên şoreşgeriyê westiyân...

Gelî Kurdan ranebin û li ber barê tu bangan nelivin. Xwe li gundên wêran û şewitî veşêrin. Ji zarokên xwe re kulorên cehî biqemirînin. Li ber temala jinên xwe rakevin û li ser hêkên xwe bilîsin, hêlînen kewan ji taviyên topên rizgariyê biparêzin. Xwe li ber çepe-rên hirî û kulavan binixumînin, danekevin jêr, danekevin bajêr, li paytextên çiravê bes bibin boyaxçî.

Gelî kurdan çekan bavêjin, perda sipî ber bi jor ve bilind bikin, pir bilind..

Li hemberî vê kilêsiya xopan rawestin!
Çek dijminê lawan e, çek neyarê mêwan e, çek her û her dijminê me kurdan e. Bi çekan şoreş çênabin, bi çekan dewlet ava nabin, kûr birînen kewan tu carî bi xenceran sax nabin.

Gelî kurdan tivingên xwe li nav mişarê tiviran biçikilînin, yan jî bikin piştî, li piştî dayikên şehîdan bikin, li ser milên wan dilşewitiyan rêz bikin, rêbikin dîr, rêbikin Şeqlawî, bihinêrin serê Metîna, stiranan ji Mam û Xal re diyarî bikin, belkî bi qûntaxên wan ji sêwiyan re goristanên fireh avabikin!

Gelî Kurdan hilkişin jor, xwe li talana gundên xwe nepenî bikin, li tu keran siwar neyên, hûn ne "siwarên rojhilat" bûn, vir e, ev pesna zingargirtî şaş e, hûn tim peyayên mirina zer bûn, zêrevanên qesrên xelkê bûn, ne şervanên pezkûviyên geliyên xwe bûn. Li tu keran siwar nebin, ne yê şeytên û ne yê Xudayî, tenê peya bibin û razên, bese hişyariya gj, bese rikberî bi kevir û çetikan re:

Tiving şoreşan li dar naxînin, çete dewletan ava nakin.

Dewlet zû bi zû pîse-mêran pak nakin!
Gelî kurdan binivin, sed salî di nav pişkulên dîrokê de razên,

Hûn li ku û parlamento li ku!!
Em ji hişyariya kor tîr bûn, em ji giriyana li ser kavi-lên Helepçeyê tîr bûn...

Tenê binivin û zarokên xwe fêrî zimanê çûkan bikin; fêrî hejandina landikan bikin; fêrî bilêvkirina lawikan bikin; fêrî xwedîkirina golikan bikin, mana me hemi-yan bi golik û golikan ve girêdayî ye.

De li hêviya golikistana mezin bimînin!!
Leylanistana mezin!!
Çekistana mezin!!
Çeteistana mezin!!

Gelî beran û golikan, gelî mirîşk û berxikan, gerde-nên xwe biparêzin, nerm-patikên xwe biparêzin, ji tûj nikulên kurdên kelaşan (ceset)...

Hûn hemû berxikên pêxemberan in..
Hûn hemû zengelorkên mirinê ne..
Hûn hemû golikên partiyên in..
Hûn mirîdên kevne şaşikan in..

Cejna qurbanê ya mezin nêzîk bû
Cenga Hewlêra mezin nêzîk bû
Mîrabûna kewan nêzîk bû
Firefira çengên kurdên kelaşan nêzîk bûn
Golikistanîno, Govenda Newroza we gelekî pîroz be!

Sersala we hemû tenî û kilêse û toz be..

Dr. Ebdulbasid Seyda:

"Têrma Mezopotamya li cem Kurdan çêjeke taybetmend werdigire"

-III-

Armanç: Madem tu li ser wêjeya kurdî peyivî, di vî warî de, ji bo çî hetanî aniha wêjeya me bê rexne maye?

Dr. Seyda: Ji bo ku rexne hebe gerek em bikaribin xwe ji hişmendiya efsanewî (eqliyeta sihrî) rizgar bikin, mebesta min, ew hişmendî ye ya ku bi tundî "Hemî" bi " Beş " ve girêdide; hetanî ku Beş ji Hemî cihê be jî. Ev hişmendî ya cadûyane wisa dirame: şewitandina beşekî ji cilên dijmin dikare ziyane bigihîne hemî dijmin an jî bes e ku ziyane bigihîne. Ev hişmendî hê jî di me de bi sewiyetên cihê cihê ji kûrahî û zelaliyê berdewan dike. Hetanî di warê siyasî de jî; rexnegirîya ku li ser helwêstekê ji helwêstên me bê gotin. em wê rexnegirîyê wek hingivandin bo hemî şexsiyeta xwe hest dikin. Lewra dema ku helwêstên me (ne şexsiyeta me) têt rexnekirin em hêrs dibin, tore dibin.

Demokrasiya rexnegirîya edebî jî ji valahiyê nayê, li ser zemîneke hişyariyaneyî pêşveçûyî ava dibe. Li ser rewîşt û gerdîşeyên demokrasiyeye resen (ne ku çêkirî!) ava dibe. Ez bawer im ku hê di vî warî de em hewcedarî gelek faktoran in.

Lê dema ku em van pirsgrêkan ji bo guftûgoyê amade dikin, hinekî hêvî dest pê dike; çînkî wê gavê em hest dikin ku çewtî pir in û çareserkerîna wan jî pêwîst e.

Gerek berî her tiştî em bikaribin ji hişmendiya gelemper a ku, yan bi (erê) yan jî bi (Na) li her tiştî temaşe dike, rizgar bikin. Çînkî şexsek bi tenha serê xwe nikare bibe xwedanê rastiya reha (mutleq). Mînakên Aflatonî (PLATO) nîn in. Di vî warî de Aristo realisttir e; çînkî jî hebûnên ber bi çav dest pê dike. Ca gerek em bişên helwêstên sofîyane li paş xwe bihêlin.

Dema ku yek ji me helbestekê dinivîsîne, jê we ye ku bi wê helbesta xwe li pêşîya bapêran xistiye û tu tişt jî nîfşên pêşero-

"Cizîra bilind a Sûrî- Iraqî û Cizîra nizim. Cizîra bilind wek ku em dizanin laşê bingehîn ê Kurdistanê başûr e. Ev yek dide xuyanîkirin ku dîroka welatê di navbera herdu çeman de (Mezopotamya) li gor sînore xwe yî pêşîn, wek ku çawan ji wan neteweyên ku di herêmê de jiyane, giring e, ji bo kurdan jî giring e."

jê re nehiştîye, rene helbesta wî ciwan û xweşik be, lê ew bixwe nikare ciwanî û xweşikbûna helbestên xelkê bibîne, mîna ku ev cîhana me dê nikaribe ji bilî helbestvanekî yan jî romannivîsekî yan jî partiyekê yan jî serokekî, bihêwirîne. Ji bo çî em ji pirjimarîyê dest pê nakin??

Herwisa bi nisbetî civata Mirîdan jî, ê mirîd dema ku kêfa wî ji şexsiyeta nivîskar re bê, bi dorbîna wî nivîskarî li hemî cîhanê temaşe dike, ku ne li cem wî nivîskarî aferandin û dahênanê nas nake, ji bo ku nivîskarê xwe berz bike yê dîtir diqurmiçîne...

Eger em bixwazin rexnegirîyê avaker damezirînin gerek em xwe ji serrastkerîna wan çewtiyan re amade bikin. Gerek em bikaribin bawerîyê bi rêjeyîya rastîyê (nisbiyeta heqî-qetê) binin. Gerek her kes di çarçewa diyalog û danûstendîneke demokratîk û berhemdar de bikaribe birûbawerîyên xwe derbibire.

Erka rexnegir ew e ku, naveroka deq (têkst) ron bike, xalên ku ji têgihîştina xwendevan re aloz bin (belkî ji têgihîştina yê nivîskar û dahêner bi xwe re jî aloz bin) eşkere bike..

Ji bo ku rexne bigihêje armanca xwe gerek rexnegirî bi dûzan be, gerek xwe bispêre bahane û pîvanên ku ji guftûgoyê re vekirî bin da ku birûbawerîyên hevbeş li ser wan ava bibin

Armanç: Wek têrm û wek dîrok, MEZOPOTAMYA ji bo me kurdan çî ye?

E. Seyda: Wek têrm, cara pêşîn MEZOPOTAMYA ango welatê di navbera herdu çeman de, ji alî dîroknasên klasîk ve (Herodotos û Stra-bon) hatiye bikaranîn. Herdû çem jî Decle û Ferat in. Li gor vê têrmê Mezopotamya ji van navçeyan pêktê:

Cizîra bilind a Sûrî- Iraqî û Cizîra nizim. Cizîra bilind wek ku em dizanin laşê bingehîn ê Kurdistanê başûr e. Ev yek dide xuyanîkirin ku dîroka welatê di navbera herdu çeman de (Mezopotamya) li gor sînore xwe yî pêşîn, wek ku çawan ji wan neteweyên ku di herêmê de jiyane, giring e, ji bo kurdan jî giring e. Mebesta min ew neteweyên ku ligel kurdan jiyane û bi hev re beşdarî geşkerîna şaristaniyeye taybetmend bûn; li gor pîvanên wan serdeman.

Lê piştê ev têrm ji bo hemî Iraqê hat bikaranîn, Iraqa îro ligel Cizîra jorîn û ya jêrîn a Sûryê. Herwisa Kurdistan wek têrm ji hin navçeyên ku di hundirê Mezopotamya de ne û jî hinên ku li derveyî wê ne pêktê.

Têrma Mezopotamya li cem kurdan çêjeke taybetmend werdigire çînkî ev têrm nûnerî û sembola tevliheviya şaristanyên cihêreng e; ku di bin sîwana pirhejmariya neteweyan de pêk hatibû.

Armanç: Baş e, wek kurd, dîsa dipirsim, rehên me yên dîrokî li kuderê radiwestin, yan jî di dîrokê de ji kuderê dest pê dikin?

E. Seyda: Hetanî aniha lêkolînger li ser teoriyekê bo destpêka pêşîn ya mirovahiyê nebûne yek. Hin bi hevbeşîya tuxum bawer dikin, ango hemî mirovahî ji komexelkekê, ku li cihêkî û di demek pir kevnar de dijiya, derçûye. Ev bawerî pir ligel nêrîna olî bi taybetî ya Tewratî, digunçe. Ev nêrîna olî dibîne ku mirovahî ji zewa-



Dr. Ebdulbasid Seyda: "Demokrasiya rexnegirîya edebî jî ji valahiyê nayê, li ser zemîneke hişyariyaneyî pêşveçûyî ava dibe. Li ser rewîşt û gerdîşeyên demokrasiyeye resen (ne ku çêkirî!) ava dibe. Ez bawer im ku hê di vî warî de em hewcedarî gelek faktoran in"

ca Adem û Hewa dest bi geşbûnê kiriye. Li nik vê teoriyê yeke dîtir jî heye ku li ser pirhejmariya tuxuman radiweste, dibêje ku, mirovên pêşîn li gelek cihên ji hev dûr û ji hev cihê peyda bûne, ev jî di rêça newekheviya zimanan, rengan û sîmayên giştî, û newekheviya gerdîşe û bawerî û dastanan, têt xuyanîkirin.

Herwiha guftûgo li ser çîroka tofanê jî heye. çîroka olî pir li ser tofana gerdûnî diidîne, li gor wê, demek, careke dî, mirovahî ji nijada Nûh hatiye vejandin.. Lê hetanî îro jî, tu mînakên berbiçav û madî bûyereke wilo neçespendine, rastiya hebûna tofaneke gerdûnî di dîrokê de neparastine. Lê di eynî wextê de, rastiya rûvedana çend tofanên herêmî; çî li vir û çî li wir, dane destnîşankirin. Reng e di wê demê de alavên ragihandinê pir seretayî bûn û asoyên hizr û bîrê sînorkirî bûn.

Mebesta min jî vê pêşgotinê ew e, ez dixwazim bibêjim ku hê li ser sewiyeta giştî pîrsa nijada pêşîn û rehên pêşîn nehatine çareserkerin, îca çawan li ser sewiyeta gelê kurd dikare bê çareserkerin.

Aniha li alî gelek lêkolîngeran ve jî nû ve li teoriya SAMI têt temaşekirin, herwisa li ya ARI jî. Em dibînin ku gelek teorî jî bo armancên siyasî tene bikaranîn; armancên ku ligel berjewendiyên miletan nguncin; miletên ku di serencama dawîn de yan dê jî vê nijadê yan jî dê jî wê nijadê bin..

Reng e hin ziman nêzikî hev bin, lê, wek ku çawan îro roj em nikarin zelaliya nijadan biçesipînin, gerek em giringiya danûstendîna di navbera miletên cihê cihê de jî jî bîr nekin.

Li gor bawerîya min gerek em ji (litevliheviya şaristanî) dest pê bikin, bi taybetî ji wan peywendiyên şaristanî ên ku li rojhilata kevnar î nêzik pêk hatibûn.

Hin, da ku ligel birûbawerîyên xwe yê ARI biguncin dibê-

jin ku kurd ji Ewropayê hatine. Hin jî li nijadeke hevbeş di navbera kurda û Silavîyan de digerin. Jixwe dagîrkerên Kurdistanê her û her hewl didin ku taybetmendiyên gelê kurd ji holê rakin, veşêrin.

Di guftûgoya di navbera kurdan û Bexdayê de ya piştî rapêrîna sala 1991 ê, ji kurdan re hate gotin ku (êzîdî) Erebin, di wê wextê de gelek kurdên nezan ji êzîdîyan û ji misilmanan piştigirîya wê pêşniyarê kirin. Ew kes jî bîr dikin ku misilmantî jî bo kurdan oleke nû ye, ku berya misilmantîyê kurd Zeredestî yan fileh yan jî cihû bûn. Jixwe (êzîdî) li gor bawerîya min serencama tevliheviya birûbawerîya di navbera zeredestî û misilmantîyê de ye.

Lewra eger em li ser peywendiyên di navbera zeredestîyê û êzîdîtiyê de rawestin emê bigihêjin vê serencamê:

Rehên kurdan, li gor mînakên li ber dest, vedigere Medya ku Zeredest li wir jî dayik bûye, li wir rêberîya xwe belav dike û piştê re diçe welatê Farisan. Lêbelê Medya di dîroka kurdan de ne her tişt e, çînkî em dê nikaribin Mitaniyan û Kaşîyan û Kûtiyan jî bîr bikin.

Ev nav ne navên neteweyan in, lê navên êl û herêman in, ku xelkên wan wek bapîrên pêşîn ên kurdan têt dîtin.

Wisa em digihêjin serencamama ku dibêje: Kurd wek term piştê derçûye, lê ew term jî kevnar e. Zinifon û çend qiralen Aşûriyan li ser radiwestin.

Gelê kurd jî gelên herî kevnar e, di serdemên pir kevnar de li rojhilata nêzik jiyabû. Ligel gelên dîtir ên navçeyê beşdarî awakirina şaristanyê bûye. Ez bawer im ku di pêşerojê de dê lêkolînen balkêş li ser vê babetê dest pê bikin û dê sîmayên vê pirsgrêkê yê giştî dest nîşan bikin. Sembola tevliheviya şaristanyên cihêreng e; ku di bin sîwana pirhejmariya neteweyan de pêk hatibû.

Wêje çi ye?


"Hertiştê min sitran e"

Helbest çewa çêbû? Çi peywendî di navbera gotinên hunerî yê mirovên çaxê pêşî mîna wêne, heykeltirâş, mûzîk û hunerê peyvan de heye? Wer xwuya dîke ku hingava destpêkî ya zincîra pêşveçûna mirovatîyê her ku diçe dûrtir dibe. Her ku zanistî bi pêş ve diçe wusa Adem û 'Hawa jî kevintir dibin. Li gor hejmarên antropologîyê yê vêga hebûna mirovan digihîje milyonek sal berê. Xebata hunermendî ku em pê dizanin beşeke pir hindîk ji vê pêla dûvedirêj digre. Ji xwe hunermendîyê di dawîya wan salên rola (dewra) kevir de ku navbera 30 000 û 15 000 sal berî çêbûna Îsa ye, di peykeran (heykelan) de, di hilkolîyê (berkêliyê) û di wênekêşiyê de şax û perr daye. Di vî warî de reng û xetên hilkolîyê bi awayekî balkêş derdikevin pêş çavên me û em dibînin ku amûretên mûzîkê, mîna flût (bilûr) û pîpîkê, ji lûlehestiyên hatine çêkirin; ji xwe mûzîk jî li pey dansê çûye. Di nexş û wêneyên hilkolîyê yê ser şikeftên Gansî û Spanî de meriv şeklên goşdêrên û rûvêj û figûrên semager ên rûgirtî dibîne. Li gor texmînan reqş û mîmîk ji wan dîlokên ku piştê bi wan re hatine gotin, kevntir in. Ji xwe tu agahên me li ser wan dîlokên nine, û bi tenê ji nêzî 5000 salî û vir ve dirûvên bûyerên (fenomen) zimanî di destên me de hene.

Ev rêzên han hinek ji destpêka cildê pêşî yê berhema "Litteratures Världs Historia", Dîroka Edebiyata Cîhanê, ye. Ev berhem 12 cild e û bi Swêdî hatiye nivîsandin; beşa pêşî ya vî cildî ku li ser wêjeya çaxê berî dîrokê ye, ji aliyê F. J. Billeskov Jansen ve hatiye amade kirin. Bi vê destpêkê re, bi tevayî ez divê hinekî li ser edebiyata cîhanê û bi taybetî jî vêga li ser ya kevnare rawestim. Serê pêşî ez ê ji her babetê, çend paragraf ji wan derve ku nivîskar di wan de li ser huner û edebiyatê dîtinên xwe anîye zimên, wergerînim û di pey de jî hinek ji wêje û hunera kevnar ya Mezopotamya ku Kurd ji herêmeke wê re "Mezrobotan" dibêjin, binim pêş çavên Xwendevanan. Herweha ger li hev bê ez ê hino hino derbasî ser edebiyata wan gelên mayî, mîna ya Misriyan, ya Babilyan, ya Cuhû, û Girekiyan bibim û tevî nimûçên wan bigihîjinim xwendevanan.

Efsaneyên Kevn û Nû

Ji xwe qet nayê zanin ku gelên rola (dewra) kevir dema çuyîna neçîrê û veşartina miriyan kîjan stranê gotine. Bi ser vê de jî dîsa tu agahên jîndar ku destpêk û rewşa kevnîya huner û helbestê bi me bidin zanîtin. Gava em li wênekêşî yan jî wan hilkolî û berkêliyên şikeftan dîniherin em figûrên ku dilibitîn, şanoyên neçîr, şer û Xwedêperestî dîbin. Tu guman ji me re nîne ku di wan wêne û berkêliyên kevnare de, gelek çîrok li ser Xwedê, li ser mirovan û li ser heywanan



Hê di salên 1830 û yê 40-î de li Almanîya, li Îngilîstanê û li Fransa qorek kitêbên erzan ku bi yê niha re himberî dikin, derketin. Gelek ji wan di bin navê "Järvägs-bibliotek", Kêtxaneya Riya Hesin, de derçûn. Ji ber ku pergala rêgihanê gelekî hasayî û xweş bûn rêwîya bi kêf ew di wan de dixwendin. Tauchnitz rêzeya xwe ya navdar ji bo dilxweşiya gelek rêwîngiyê anglosaksî ku li Ewropa digeriyan, li Leipzigê derxist.

"Mezopotamya ku Kurd ji herêmeke wê re "Mezrobotan" dibêjin, binim pêş çavên Xwendevanan."

hebûne. Li ber wan, beyt û lawîj (qesîde, îlahî) hatine gotin, qurban hatine serjêkirin û gelek kiriyarên olperestî hatine kirin. Li nav wan der û dorên efsûnî (magic, nesuruştî) lawîk (lîrik) celebên zargotinê û diram derketine holê û hatine parastinê. Wek temamên efsûnan li vir jî qalib, qaide û rastveguhastin (riwayet kirin) ya herî girîng bûye. Nexwe em di wê cîhana ku xwedî efsaneyên tije heyecan û xwedî adetên xurt in, de dijîn.

Meriv efsaneyê, wek agahdarî di heqê Xwedayan de û peywendîyên wan bi cîhanê re dibîne, lê divê pêşî em cudahî têxin navbera du cureyên efsaneyê. Efsaneyên pêşî di biwara avabûna cîhanê de ne, ango di heqê wê tekoşîna herî pêşî de ku jiyane pê zora mirinê biriyê, bê we ku gava geremol (kaos) bûye gerdûn. Di eslê xwe de efsane bawerî ye, lê dibe ku ew ji bawerîyê jî bê cuda kirin û dema ew edî ne bawerî be hingê xuy û dirûvên wê diguhirin. Hingê ew bi serê xwe şekil distîne; eyn fena ku nivîsevan babeteke dîrokî bide destê xwe û lê kêr û zêde bike.

Mesele (hikaye) û Çîrok

Li ba T. S. Eliot nivîserê romayî, Vergilius (70.19 berî Îsa) li pêşiya klasîkvanên Ewropî giş e. Nîşên kevntir jî wî him di *Inferno* [dojeh, cih yan jî wextê dojehê, ev navê beşa pêşî ji berhema Dante ya *Divina Commedia* ye] û him jî di *purgatorio* [li gor dêra katolikên Romayê ew rûpajîyîya piştî mirinê ye]-yê de wek rêçenasê Dante dîtine û pîrozîkirine. Di berkêliya Claude Mellan de ku li ber ya Poussin [Poussin Nikolas (1993 yan 94 û 1665) klasîkvanekî Fransî yê pêplûka pêşî ye di wênekêşiyê de] çêkiriye, Apollo [Ev di efsaneya Grekiyan de navê Xwedayê roj, ronahî, mûzîk, zanistî, helbest, huner û hinekî din e] taca kullîkan ku sêmbola şa'irê bi rûmet e daye wî [Vergilius]. *Berga hundur ji berhemeke Vergilius, Paris, 1641.*

Rehên helbestê xwe bi rehên dîroka mirovaniyê û bîrewerîya wê ya îroyîn ve gelekî kur berdîdin. Himê hunera helbestê ji bilî efsaneyê xwe digihîjîne mesele û çîrokan jî û ev formên wan yê kevnare hê jî bi ber in. Efsane, mesele û çîrok sazûmanên wusa ne ku timî best û îlhamê dane merivan û her gav reng û awayên nû girtine. Ew taybetmendîyên qîrrese yê hunerê peyvê hê jî weke îro dijîn - û ji bo her berhema edebî dibe ku ev pîrsa heja bê kirin: Ma gelo eva han efsane ye, yan mesele ye, yan jî çîrok e? - yan jî mirov dikare tiştêkî bi van herdu, yan jî hersê awayên helbestê yê kevnare bike.

Di edebiyata meseleyê de girîng e ku yek, cudahî bêxe navbera meseleyên efsûnî (nexwezayî), yê dîrî aqil û bawerkirinê, yê jiyana merivan û yê dîrokî, bi piranî jî dîroka herêmî. Bê guman di edebiyatê de gelek serpehatiyên sêrbazî, xeyaletgêrî û sawîrî heya bigihê yê romantîkî, bi pêş ve çûne û belabûne. Ew di baciyan gelêrî yê serdema navîn de, di şanogerîyên pêla Ronensansê de û di peryodên romantîka germanî tev de didomînin ta ku ew bi Ibsen Peer Gynt re li himber ro-

nahîya romantîkê derdikevin û dîsa wek kevir hişk dibin.

Ew mesele û bûyerên li ser mêtîya herêmî, ewên navçeyî ku li ser beg û rênçberan û li ser rêbirr û xelkê hatine nivîsin, ew metelokên kurt û qîseyên dûrûdirêj tev bûne material ji bo wan roman û hikayeyên bêhejmar.

Heçî efsane ye ew tê deynkirin, mesele jî digere lê çîrok timî diferqize. Di kitêba piçûk ya Edward Lehmanê Danmarkî ku li Swêde bûye profesor, "Almuelliv og eventyr" (1910), de weha dibêje: "Banuya çîrokê [Cinderella, ew jina serekrol ku navê wê di efsane û çîrokên navnetewî de derbas dibe û bedewiya wê nehatiye zanîn] Berî James Cook li dora cîhanê geriyaye". Di eslê xwe de daxwaza jiyane bi xwe, ya xweparastinê û ya gelek dîfîniyên (hîssên) sirt yê ku ji nişka ve çêdibin jî bi efsaneyê ve girêdayî ne; lê heçî mesele ye avakirina wê li ser dîndayîn û bîranîyê ye. Bes çîrok bi gelek awayên cihê tîn sazîkirin, ew kurt, hêsayî, gelêrî û wek yê zarokan ku di çîrokên "Brøderna Grims" de wênekîrî hatine, tîn dîtin. Herweha gelek çîrokên dûvedirêj jî, mîna yê "Hezar û Şevk" di nav çîrokên rojhilatê de hene. Lê di Romanîka Bakur [Mebest pê Welatên Bakur ên Ewropa ne] de çîrokên Rojhilat û yê Rojava bi awayekî balkêş rastî hev hatine û wusa jî hatine veguhastin. Ji xwe di vê dema nivîseriya nûjen de jî em rastî gelek beşên hunerê gotinê yê kevnare, mîna efsane, mesele û çîrokê, tîn.

Heçî bersîva pîrsa: "Ka helbest çi ye?" Dikare weha bê dayîn: Helbst afirandinê gotinan ne ku di wan de zagonên giyana mirovan yê efsaneyî û tije hîss derdikevin pêş û hingê jî yan ji xakê çîrok û meseleyan bûyer tîne zimên, yan jî fantazî bi dil û can helbestvanî bi xwe re kaşdikin.

Edebiyata Nivîsandî û ya Weşandî

Ji pêş jî hate zanîn bê çewa rehên edebiyata nivîsandî bi ya ne-nivîsandî ve kûr diçin. Kesê ku li ser cin û xeyaletan dibêje (xeyaletbêj) sitranên xwe nanivîsîne; ji xwe efsane, mesele û çîrok di mejiyê xelkê de dijîn. Mirov û civakên wan bi hezar salan bê zimanê nivîskî mane û hê jî hinek ji wan dimînin, lêbelê niha jî ev çavkaniyên jîndar biriyê didin edebiyata pey xwe û wê xurt dikin. Wek musik û wênekêşiyê helbest jî her tim dadigere ser binyata xwe ya kevn yan jî ya gelêrî.

Nexwe wêje ji nivîsandinê kevntir e, ruh û xeyalet jî li pêşiya tîpan (herfan) hatine û digel vê yekê jî dîsa gava di civakê de zimanê nivîsandinê bingehê xwe davêje hingê şoreşek pêktê.

Rewanbêji (rhetoric) û Sembolî

Heçî edebiyat e ew bi nivîsê re hatiye ser ruyê cîhanê. Peyva "gramma" bi Girekî (Yûnanî) wateya nivîsandin, hilkolî (berkêlî) û bertaşiyê (dataşinê), yanî nişaneyên nivîsînê ku tîp (herf) e, dide. Herweha ji vê gotinê, Grekiyan (Yûnanîyan) peyva "grammatikê"

çêkiriye, ku maneya dersdana nas-kirina tîpan dide, ango binivîsîne û bixwîne. Li hember vê "gramma"-ya Grekiyan jî "littera"-ya, tîpa, Latîni heye; piraneya wê "litterae" ye û ji bo tiştên nivîsandî mîna name, dokuman, kitêb, nivîsevanî yan jî kitêbên welatekî giş tê bikaranîn. Li pêşber "bêjeya "grammatikê"-ya Grekiyan jî di Latîni de peyva hunerî ya "litteratura" ku bi wateya fêrbûna xwendin û nivîsandinê ye, hatiye sazîkirin.

Wer xuya ye ku edebiyat, rêzîman û rewanbêjiyê bi hev ve dikelîne. Belkî meriv karibe bibêje ku: "gava daxwaza şekildanê hebe hingê ziman dibe nivîs; herweha dema tekstek bi sîfîlekê (awayekî nivîsînê) hatibe nivîsin û bi hev ve hatibe girêdan ango sazîkirî û avakirî be hingê ew dibe edebiyat". Meriv nişanên avakirina edebiyatê di pexşana rojane wek daxuyanî, rapor, bendên berdadgehê, nameyên evîne notên rojane doktorake filosofî yan jî teswîreke dîrokî giş de dibîne.

Helbestvan û Civak

Belê, helbestvan çi ye? Ev pîrs weha jî tî pîrsîn: Helbestvanek di

"Bi Ronensansê û humanîzmê re şa'irên mezin û şareza, "doctus poeta", giramî û navdêriyeke fermî sitandin. Bi zimanê zanayan, Latîni, helbesteke wusa hate afirandin ku di wan zimanên zêndî de, bi awayên cuda û siloganî, guhartinan anî holê. Şanogerîyê jî ji nû ve li nik helbestvanan cihê xwe yê girîng girt û bi vê re em şanogerên wek Şekspîr û Molyêr ku ji bo şanoyên xwe dinivîsandin, dibînin."

çêxê xwe de çilo dişixule? Pir girîng e û divê eseyî bibe ku helbestvan di nav civaka xwe de timî xebitîye û di kîja çaxî de dibe bira bibe edebiyat, bê kêmanî helbest jî bûye beşek ji civaka xwe. Helbest tu carî nebûye berba ango li ber bayê neçûye û tekoşinê wêjeyî bi piranî ji bo bicihkirina xwe di nav mînakên civakî de ku di rîya şekil sitandinê de ne, hatine dayîn.

Di civata tîkel û pirawa ya serdema navîn de em celebên helbestvanên cihê cihê, wek şa'irê Latînzanan î gernas, lawîkbêj û dîlokvanê evînan û meyxaneyê, şa'irê kubar î esilzade, tembûrvanê dilruba î coşidar û aferîndeyê helbesta lehengê mezin, dibînin. Bi Ronensansê û mirovperwerîyê (humanîzmê) re şa'irên mezin û şareza, "doctus poeta", giramî û navdêriyeke fermî sitandin. Bi zimanê zanayan, Latîni, helbesteke wusa hate afirandin ku di wan zimanên zêndî de, bi awayên cuda û siloganî, guhartinan anî holê. Şanogerîyê jî ji nû ve li nik helbestvanan cihê xwe yê girîng girt û bi vê re em şanogerên wek Şekspîr (Shakespeare) û Molyêr (Molière) ku ji bo şanoyên xwe dinivîsandin, dibînin.

Klasîkvan çi ye (ki ye)?

Li gor şa'ir û rexnegirê nûjen yê îngilîzî T. S. Eliot nişana klasîkvanîyê gihastina rû'î û ya



ziman e, çiku ew di 16-yê çiriya pêşîn ya 1944-an de di semînerê de dibêje: "Klasîkvanek bi tenê di nav çandê gihîştî û di nav edebiyat û zimanekî stewiyayî de digihîje, berhemekê klasîk jî divê ji giyanê (ande, rûh) gihîştî bê holê". Ji ber vê yekê jî divê berhemekê bi vî awayî, ji nav gelekî xwedî dîrok û xwedî hîwûşî (adet) derkeve, gava ew berhemê bê dayîn ji gere di ahengeke tîr î lihevhatî de be. Li cem klasîkvan em rastî berfirêhî, gelemperîtî û çihansîmûliyê (gerdûniyê), bi gotineke ku vî tevî di xwe de bigire "catholicity"-yê, tîn.

Nêzî sed sal berî T. S. Eliot, di sala 1850-î de daxwaza bersîva vî pîrsê ji rexnegirê mezin yê Firansî, Sainte-Beuve, tê kirin. Ew wek yekî ku Latîni ye dest bi diyarkirina eslê gotinê dike. "Li cem Romayîyan xelk li gor hatin û qezenca xwe dihate dabeşkirin û ji yê halxweş î dewlemend re jî "classic" dihate gotin. Lêbelê nivîsevanekî piştî wê demê, Aulus Gellius, vî gotinê wek "classicus scriptor" jî bo nivîserê qada bilind bikaranî. Ji bo wêjeyên nûtir klasîkvan bûne ew mînakên mezin ku hêz û peywendiyên wan kevnepîrî û hîwûşiyê bi xwe re digihînin nişfên pey xwe".

Kengê mirov berhemekê edebî wek klasîk dibîne? Ji bo vî yekê divê du hengav hebîn heya ku yek biwêrîbe wê berhemê biciribîne. Derba pêşî pîncî sal piştî weşandinê ye. Ger berhemek yan jî şanogeriyek nivîsê sedalekî piştî weşandinê xwe hê jî ji bo xwe [ne ji bo xatir] bê xwendin yan jî leyîstandin hingê şensekî wê yê qenc heye ku ew demekê dirêj bijî. Carna endamên Akademîya Fransayê wanên wusa bi "nemir"-iyê bi nav dikin. Gava nivîsevanekî ne pir baş dawiyê jî bo wê hate hîlbijartin, wî jî kêfa qîreke weha da: "niha ez nemir im - jiyana min giş!" - Nemir jî bo berhemekê edebî ku du sed sal piştî çêbûna xwe hê jî bijî wek ewlekirin û sigortakirinê tê ditin. Gelek berhem jî nav wanên ku vî gava nemir hatine diyarkirin wê di cildê pîncî û şeşan de bîn, lê wek nimûne em ji nav wan dikarin Ansîklopedîya Fransî ya "l'Encyclopédie française" ku di navbera salên 1751-80-yê de der çûye, bîdin. Digel ku ew gelek berî wextê lînerînê niha derketiye jî lê iro jî ew weke hingê balê dikşîne ser xwe.

Bes kitêbek bi carekê nabe nemir, klasîkvan dimire lê car din li

Li her derê cîhanê nimûne hene ku mirovan hê jî dema berî dîrokê ve xwestine bi nişane û sembolan agahdarî bidin. Nişaneyên vî wêneyî li gor rêzê ev in:

1. Ev berên piçûk î wênekirî yê Mas d' Azîlê ne ku dikeve başûrê Fransa.
2. nişaneyên geometriyê li Spanya
3. nişane û figûrên li Îtalya
4. sembolên (dawer) ser dîwar û qafikan li Kreta.
5. wêneyên figûrên mirovan yê li ser tatikan li Bakurê Afrika?
- 6-7. hilkolî û berkeliyên li Kaliforniya (California)
8. û yê li awistraliya

jiyanê dadigere. Homeros gelek demên ketin û rabûnê ditîne; gava Ewropiyani di nîveka sedsala 1600-an de Şekspîr (Shakespeare) keşf kirin hingê ew bû fena ku topeke edebî biteqe.

Tê gotin ku "ger berhemekê helbestê piştî derketina xwe demekê gelek dirêj di ber xwe de bide û xwe biparêze hingê tê bawerkirin ku ew berhem jî bo mayîne hatiye". Lê rastiyeke tahl jî ew e ku pîrên kitêban bi tenê demekê kurt dijîn. Dibe ku nivîsevanekî biserkeftî li welatê xwe bê jîbîrkirin jî lê dîsa ew heyamekî pîrê dirêj û zahf xurt, bi bandorî li deravayî welêt bijî.

Huner û helbest dikeve nav wan amûretên ku mirovanî, bi alîkariya wan jî xwe re li riyên nû digere. Ji ber vê yekê jî helbest weke xeyal yan jî fena protestoyê dibe rêber û herweha dîroka wêjeyê, tevî gelek tiştên din dibe rêçenas jî bo vî hîwûşiyê. Ji xwe çiqas sazûmanîya gel bilind dibe, çendî zanîn û hînbûna me têkel dibe pêşveçûna kesaniyê (şexsiyetê) jî ji bo kesê xweser hê bêhtir girîng dibe. Dîtina rîya çavkaniyên edebiyatê kare biryareke pir girîng bi xwe re bîne û di vî dema dostaniya germ î sermedî ya nav xelkê û welatên cuda de dîroka wêjeyê bivênevê dibe cewetek jî bo naskirina dîtinên hinek neteweyên din. Bi vî re rastiya nêrina Goethes ya mîrkûrî (dahiyane) ku: "Wê edebiyata cîhanê bibe sedemê têgihîştin û biberketina wê", îro hê zahfîr derdikeve.

Ev jî Berhemekê Swêdî ya bi navê "Litteraturen Världs Historia", Dîroka Edebiyata Cîhanê, jî hinek ciyên cildê pêşî, yê bi navê "Fornitiden", heyamê berê/berî dîrokê, jî navbera rûpelên 11 û 54'an hatiye wergerandin

Emin Narozi



Ji Konferansa Ahmedê Xani, ji destê çepê berbi rastê; Hesen Qazî, Martin Van Bruinessen, M. Malmîsanîj, Joyce Blau, Mûrad Ciwan

Prof. Joyce Blau

"Gava mijar zimanê modern be, em li ser Armançê dixebitin"

Di 27. 05. 1995'an de bi însiyatîva Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê bi munasebeta sêsedesaliya nivîsandina destana Mem û Zînê li bajarê Stokholmê konferansek hat çêkirin. Civaka Kurd li Swêdê jî bo vî konferansê enteresseyeke gelek mezin nişan da. Ji Hollandayê sosyolog Dr. Martin van Bruinessen, ji Fransayê profesor Joyce Blau û jî Swêdê jî Mûrad Ciwan wek konferansiyer li ser hêlên cuda yê Ahmedê Xani û Mem û Zînê rawestîyan. Xanima Joyce Blau di 30.05.1995'an de buroya Armançê ziyaret kir. Me jî ji bo xwendevanên xwe di derheqê vî konferansê û beşê Kurdî yê li Unîversîteya Sorbonê de çend pîrs jî pîrsîn.

Armanç: Tu dikarî lênerînen xwe yê li ser vî konferansa ku bi munasebeta sêsedesaliya nivîsandina Mem û Zînê hat amadekirin, ji bo xwendevanên me diyar biki?

Joyce Blau: Beriya ku ez bersîva pîrsa we bidim, ez dixwazim sipasî hemû xebatkarên Armançê bikim ku hûn jî bo parastin û pêşdebirina ziman û kultura Kurdî xebatên bêhempa dikin. Armanç jî 1979'an û vir de derdikeve û ez wê jî despêkê de taqîb dikim. Armanç rojnameyêke pîr baş e û wekî din jî di nava rojnameyên Kurdan de ya herî emirdirêj e. Em di dersan de Armançê û nemaze jî xaçpîrsa wê pîr bi kar tinin. Gava mijar zimanê modern be, em li ser Armançê dixebitin, gellek nivîsên wê werdigerînin Fransî û wan dikin mijarên dersên xwe.

Nuha jî ez dixwazim vegerim ser pîrsa we ya li ser vî konferansa ku ji aliyê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê û Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê hatibû amadekirin; ev fîrseteke gelek baş bû ku bi munasebeteke weha di derheqê Ahmedê Xani û Mem û Zînê de agahdarî hat dayin. Gava ez jî bo vî konferansê hatim dawetîkirin, ez fikirim ku bê ez ê di vî warê de bikaribim çî bikim. Ji ber ku di vî warê de xebatên kesên wek Izzeddîn Mustefa Resûl, M. Emin Bozarşan, Elaaddîn Sec-

cadî û hwd hene. Lê dîsa jî min xwest ku ez beşdarî vî konferansê bibim da ku bikaribim bi Kurdên Swêdê re di vî warê de munaqeseyan bikim. Divê ez diyar bikim ku ez bi vî konferansê gelek kêfxweş bûm ku Kurdan bi vî rengî enteresse nişan dan û beşdarî munaqeseyan bûn. Ez hêvî dikim ku civîn û konferansên bi vî rengî dê li welatên din jî her berdewam bin.

Armanç: Tu dikarî ji kerema xwe re li ser dîroka beşa Kurdî ya Unîversîteya Sorbonê hin agahdariyan bîdi?

Joyce Blau: Beşê Kurdî di INALCOyê de di 1945'an de bi saya xebata Kurdolog û diplomat Roger Lescot hat vekirin. Navê wê yê demê R. Lescot O bû û ev nav jî di 1970'yê de hat guherîtin û bû INALCO. Roger Lescot yek ji wan kesan bû ku bi grûpa Hawarê re dixebitî. Têkiliyên wî û Bedirxaniyan di salên 1930'yê de li Beyrûdê dest pê kirin. Ew piştî şerê cîhanê yê duyem hat Parisê û pêşniyarî Unîversîteya Sorbonê kir ku li beşê zimanê Rojhilafî (Langues O) dersên Kurdî bide. Wê demê R. Lescot diplomatekî Fransayê bû û jî ber vê yekê gotina wî pere dikir. Îdareya Unîversîteyê jî pêşniyara R. Lescot qebûl kir û bi vî awayî ev beş hebû.

Piştî biryara Unîversîteyê R. Lescot du salan bi serê xwe kar dike, lê gava tayîna wî ya konsultiyê hat, jî Kamûran Bedirxan (1895-1978) re nameyekê rê dike da ku were Parisê û di beşê Kurdî de dersan bide. Kamûran Bedirxan ev dawetiye jî bo ku bikaribe di warê pêşdebirina doza Kurdî de baştir kar bike, wek îmkaneke dit û jî ber vê yekê bi dilxweşî qebûl kir. Kamûran Bedirxan jî 1947'an heta 1970'yê bîyî rawestan di vî beşê de kar kir. Thomas Bois (1900-1975) jî wek mamosteyê vî beşê jî 1966'an heta 1970'yê bi Kamûran Bedirxan re xebitî. Thomas Bois bi taybetî li ser medeniyet, jiyana civakî ya Kurdan, folklor û kultur û edebiyata Kurdan ders dida. Ji ber nexweşîya wî di sala 1970'yê de doktoran êdî destûr nedanê ku xebata xwe bidomîne.

Di 1970'yê de temenê Kamûran

Bedirxan jî gihîştîbû 75'an. Ji ber vê yekê min di vî beşê de dest bi kar kir. Nasîna min û Kamûran Bedirxan ne di wê demê de, lê herweha beriya salên 1960'î dest pê dike. Ez dixwazim li vir diyar bikim ku Kamûran Bedirxan di gelek waran de ji min re bûye alîkar û heta di teza min alî ser Kurdan de jî kedeke wî ya pîr hêja heye.

Wek ku min got, ji 1970'yê û vir de ye ku ez wek seroka vî beşê dixebitim. Piştî 12'ê Adara 1971'ê M. Ali Aslan hat Parisê û bi qasî sê salan di vî beşê de dersên Kurmançî da. Ji 1976'an û heta 1978'an jî Abdulrahman Qasimlo di vî beşê de wek mamoste kar kir. Divê ez bidim diyarkirin ku Qasimlo û M. Ali Aslan xebat û sewiyeya vî beşê pîr pêş de birin.

Armanç: Gelo tu dikarî hinekî ji behsa rewşa nuha ya vî beşê biki?

Joyce Blau: Ev beş jî sê qonaxan pêk tê ku li ser hevdu şeş sal in. Qonaxa yekem du sal in. Xwendevan di vî qonaxê de dîrok, medeniyet, ziman û edebiyata Kurdî dixwînin. Herweha dersa wergerê, gramer, îslamiyet, cografyaya Rojhilata Navîn û zimaneke rojhilafî (wek Erebi, Farsi, Tirkî, Afganî û hwd) jî li gel van dersan tê xwendin.

Di qonaxa duyem de ku ji sala sisîyan û ya çaran pêk tê, xwendevan jî bo wergirtina lîsans û mastera xwe dixwînin. Qonaxa sisîyan -ku ji sala pîncan û şeşan pêk tê- jî salên doktorayê ne.

Nuha em bi du zaravayên Kurdî (Kurmançî û Soranî) dersan didin. Wek hûn dizanin heta 1973'yan bi tenê dersên Kurmançî dihat dayin. Çar asîstanên me yê Kurd hene; jî wan Xusro Abdullahî Mandulkanî û Serdar Barak asîstanên zaravayê Kurmançî ne, Helkewt Hekîm û Abdullah Merdûx jî yê zaravayê Soranî ne.

Xwendevanên me gelek in. Pîrriya wan Fransî û biyanî ne. Belkî jî bo we enteresant be, Ji Tirkiyeyê Yalçın Küçük jî di beşê Kurdî de Kurmançî û Soranî dixwîne. Hin xwendevanên me yê Kurd jî hene.



Zikê min diêşe !

Zikê min diêşe! Min savar jî nexwariye! Qey ji meraqa ye. Gerçî ez çûm duxtor, got: gastrît e, yanê destpêka ulserê. Ulser ne kula salê ye, lê jê xerabtir e. Dermanê wê jî cixare, araq û îsota tûj e!

Ez cixarê dikişînim, îsota tûj piştî zewacê min dest pê kir, lê araq, na! Ez nikanim vexwim. Bîna wê ne xweş e! Ji xwe bi qedehê ez serxweş dibim.

Serxweşî xweş e. Meriv hê rehet qise dike. Tiştê ku di nêserxweşiyê de mirov nikane bibêje, di serxweşiyê de mirov pir bi hêsani dibêje. Ma ne ji ber wê ye ku her tim li masa serxweşan şer derdikeve, pevdîcinin, bi hev dikevin, an jî hevûdu dukuvin.

Kuştin ne baş e. Bi kuştinê meriv nagihîje tu derekê. Cengîz Xan û vê dawîyê jî Hitler gelek kes kuştin. Lê çi? 'Emrê wan têr nekir. Bi mirada xwe şa nebûn!

Zikê min diêşe, dilê min

diçe cixarekê û îsota min têt!

Na welleh! Ya rastî xewa min têt. Û zikê min diêşe. Û çavên min diçin ser hev. Ger ez di xew re biçim berçavka min ê bişkê. Bê berçavk jî ez nikarim rakevim. Çimkî wê wextê jî di xewnê de ez nikarim net bibînim! Ji xwe nuha çar berçavkên min ên şikestî, yeka nîvşikestî heye û ya saxlem a li ber çavê min jî ne tède.

Zikêşî ne bes bû îcar çavxerabûn bi ser de hat! Ji xwe ezê qala êşa diranan nekim!

Ero qet di eynî wextî de hem zikê we û hem çavê we û hem jî diranê we êşiyaye? Na! Axx, axx! Hela bila biêşe wê wextê hûnê jî halê min fam bikin ku ez di bin kîjan şertan de bi çi zor û zehmetî û bi taybetî jî di bin kîjan îşkenceyan de van çend rêzên xwe yên nexweşîk ji bo we dinivîsim!!!

Çîroka Adem û Hewê û zarokên Harbîl û Karbîl wan

Tarîxa Kurdan û ya însaniyete bi hev re dest pê kirine. Loma jî gava ku çîrokzanên me yên tarîxzan dinivîsin divê ku ji destpêka însaniyete dest pê bikin; yanê ji me Kurdan! Çimkî destpêka însaniyete em in.

Bav û kalên mirovan -ku ji teref hemû dunyê ve têt qebûl kirin- Adem û Hewê ne û ew bi xwe destpêka însaniyete ne û Kurd in. Wê wextê bi hêsani mirov dikare bibêje ku însaniyete bi me Kurdan dest pê kirîye.

Vêca hûnê bibêjin çima? De ka bisekinin ez ji we re bibêjim.

Carê, navê Adem û Hewê bi xwe bi Kurdî ne. Çimkî Adem wekî hemû alim dizanin ji herîyê yanê ji çamûrê hatiye afirandin. Îcar bi Kurdîya pir-pir-pir û gelek kevn ji çamûr û herîyê re digotin "avzêm" an jî "avzem". Û ev gotina "avzêm"ê nuha jî li hin deverên Kurdistanê yên şikeftwarî jî têt bi kar anîn.

Belê em dîsa werin ser gotina Adem. Îcar bi dûr û dirêjî ez nikarim ji we re tehlîla wê bikim, lê li gor dema ku em têt de ne -divê ku mirov gelek bi lez, zû û di demek kurt de kar bike-ezê ji we re pir kurt di hundurê demê de ji alî etî-


molojîk û guherînolojîk qalib û kiras guhertina vêt gotinê binivîsim. Belê, guhê xwe giran mekin û çavê xwe megrin, binêrin:

Avzêm--Avzem- Avdem - Adem

Wekî hûn jî dibînin, formulasyona me ya guherînolojîka etîmolojîka peyvê li ber çava ye. "Z"ya di "Avzêm"ê de berê wek "zal" a Erebî bû, lê di nav sûrec û merhele û pêvajoya zimanê me yê sor î dirêj de ev "Z" guherî bû "D" (wek guherîna di zama û damat, zerya û derya de). Îcar piştî demekê ji ber tembelî û teralîyê me "V" jî daqurtand û tenê "Adem" ma.

Ji bo Hewê jî hin tehlîl û lêkolînên etîmolog û guherîtologên Kurdan hene ku dibêjin gotina "Hewa"yê jî ji "Herweha"ya Kurdî hatiye. Lê bi a min ez dibêjim hema kurt û kurmancî, jin gava ku dizewicin bi ser milletê eşîra mêrê xwe ve têt hesibandin. Îcar gava ku Adem (ku êdî îspat bûye) Kurd be, bivê nevwê jina wî jî wê li ser Kurdan were hesibandin.

Pişt re Xwedê du kur dan Adem û Hewê. Ji xwe jî navê Zarokên wan jî mirov têt derdixe ku malbata wan



malbateke xwerû Kurd bûn.

Karbîl ji ber ku pir bi kar bilî dibû bavê wî jê re digot "karbîl" yanê yê ku bi kar bilî dibe.

Harbîl jî gelek nerehet û har bû, bavê wî jê re digot "Harbîl", yanê yê ku bi harîyê bilî dibe. Ji xwe Harbîl (yan jî Harbîl)pişt re ji ber vêt harîtya xwe neheqî li birê xwe dike ji bo perçeyek erd radibe wî dukuje.

Bêguman ji vêt yekê jî xuya dibe ku her çendî însaniyete jî me Kurdan dest pê kirîye, lê her weha hevûdu kuştinê jî bi me Kurdan dest pê kirîye.

De neyse, destpêka însaniyete û ya hevûdukuştinê li me pîroz be!

Kerê Mellê

Li hêla Mêrdînê, li gundê 'Ewêna her kes xwedî ker e. Gundî her şev li mala yekî rûdinin û behsa başî û xurtîya kerên xwe dikin. Her şeva ku gundî li oda gund dicivin, mellê gund jî her tim li wê ye, guhdariya wan dike.

Rojekê serê sibê Melle li kerê xwe siwar dibe û berê xwe dide derveyî gund. Gundîyek li ser xênî ji Mellê dipirse:

-Bi ku de diçî Melle?

Melle mirûzê xwe tirş dike û bi ruyekî nîvxe-yî-dokî dibêje:


-Ez êdî li vî gundî namînim, ev gund ji min re herame!

Gundîyê ser xênî:

-Çima Melle? Kanê bêje çi bûye?

Hinek gundîyên din jî têt, hemû li hev şaş dimînin, ji hev dipirsin, lê tu kesek pê nîzane ku Melle ji bo çi xeydiye. Gundîyek jê dipirse, Melle jî dibêje:

-Ma xwedê jê razîno, ev serê çend mehan e ku ez li gundê we me û mellefîya we dikim, hûn her şev rûdinin qala kerên xwe dikin, we tu rojekê qala kerê min nekirîye. Ma ev e îsanetî, ev e musulmanî?



Gundî hemû li hev dicivin, paşî digihîjin biryarekê ku gundîyek li ser xênî biçîre û bide diyarkirin ku kerê Mellê li gund baştirin ker e û gundîyek derdikeve ser xênî û diçîre û weha dibêje:

'Ewêna xweş 'Ewêna
Sê sed û sî ker lê na
Serekê di kera kerê di Mellê na!

Piştî vêt anonse kêfa Mellê têt û berê xwe dide mizgefta gund!

helbestek gelek xweş û bi tahm

-Ji pitika mina şeş mehî re-

(Ev helbesta min ji alî pitika me ya şeş mehî pir hat ecibandin. Kêfa wê gelekî ji vêt helbesta min re dihat. Çimkî wexta ku min dixwend, wê jî li min mêze dikir û destê xwe li ba dikir û nigên xwe li erdê dixist û dibişirî. Lê piştî ku min xwendina helbesta xwe xelas dikir û disekinim, îcar dest bi girîne dikir. Min careke din jê re dixwend dîsa dest bi kenîne dikir. Ji ber wê ev helbest di tarîxa jîya min a helbestvanîyê de cîyekî pir bi qîymet û hêja û pîroz werdigire. Çimkî pitikên şeş mehî hê melegên Xwedê ne. De îcar hûn xwendevan bifikirin ku çi bûyereke dûr û kûr e.

Ma ji xwe di vêt roja îroyin de ger ne ji pitikan be, kî dikare guhdariya helbestvanekî wekî min bike.)



ÇÛST
PÛST!

Xurr

Zurr

Qurr

Xirr

xirr...

Turr

turr...

Çûst!

Pûst !!?

îsk, isk,

isk!

Wîîî !!

Ma

Hûn

Hê

Guhdariya

Min

Dikin?

AVA XWE RIJAND

Siwarek hat ber xanekê, ji hespa xwe peya bû. Hespa xwe girêda û ket hundur. Kurikek jî li ber derîyê xanê bû.


Piştî demekê siwar derket û xwest ku li hespa xwe siwar be.

Kurik got:

-Apo ez texmîn nakim ku tu bikaribî hespa xwe bajo!

-Çima?

-Ji ber ku hespa te benzîna xwe hemû bi erdê de rijand!



MED TV Pîroz Bo!

Haydar DILJEN

Roja 30 dê mengda Adari bî. Embaz û dostê min Malmisanij zî meymanê min bî. Vera şanî embiryanêdê min telefon kerd û va "telewizyonê Kurdî dest pa kerd." Min va "kotî di vijêno?" Embiryanê min va "cadê Show TV'ê verênî di vijyêno." Verî ki ez xeberî bida meymandê xo û qeçkandê xo, min komandoyê TV'î girot û bi gîştê xo ya gird a maka ci bi heyecan a şidênê. Bi no şidênayîşdo bi heyecan a, Aramê Tigran camdê Televizyonî di vijya. Min bi çimandê xo ya bawer nêkerd. Ez, Malmisanij û xanima min, ma ode di bî. Ma hemini zî bol kêf kerd. Hirê heme qeçkê min zî odandê ma yê bînan di bî. Min veynda eynan zî, ê zî amey salonda ronîştîni û winyay televizyondê Kurdî ra. Şima do wexta kêfkerdişê ma hemini bidîyayê. Perî çinêbî ki ma pa biperê. Ma tana nezdi ra winyay ci ra ki nameyê ci zî MED TV yo. Bi no name ya kêfê ma hewna weşêrî bî.

Dima çend embazan, dostan û şinasnanê ma ê bînan zî ma rê telefon kerd û waştî ki xebera televizyondê Kurdî bidê ma. Mi zî çend keyan rê telefon kerd. Labirê Kurdî tavilê pey hesiyay bî. A şewî qandê xebervilakerdişê MED TV'î, telefonê Kurdan him her welatî miyan di û him zî mabêndê welatan di qe nêvinderdî.

Demeyê nikay, demeyê zanayey û komunîkasyonî yo. Çi ze şexis û çî zî ze millet, kamî ki zanayey û wêrê dezgeyandê komunîkasyonî bê, ê do raver şîrê û bi ser kewê. Goreyê tayn beyanan, Turkiye di 386 kanalê televizyonî estê. (Biewnî Hürriyet 10.04.1995). Nê heme kanalî zî, bol-tayn, dişmeneya Kurdan kenê. Kîştê ra bi awayêdo nêdiyaye ya Kurdan asîmîle kenê, bi urf û edetandê Kurdan hu-wenê, kîştê bini ra zî propogandanê dişmeneyê zalimeya dewletî nimênê. Ma şima meselada êrişberdişê Kurdîstanda Iraqî di nêdî ki muxabîranê televizyonan û gazetandê Tirkîya senî zey temsîlkarandê ordî boşboxazey ker-dê.

Ewro asîmîlasyonî ki televizyon, gazete û mektebê Tirkîya ê yê kenê her demî vêşêrî yo. Bi zor û zilm a vengkerdişê Kurdistanî û Tirkîya ra vilabiyayîşê Kurdan, o yo karê asîmîlakerdixan rihaterî keno. Yanê ewro Kurdan ser o tesîrê asîmîlasyonî biyo felaketê depremê xirabêrî. Di şertandê winasînan di bi mecmua û gazetandê mengênan, pancêrojênan, hefteyênan û hetta rojênan a Kurdî nêşenê xoverro bidê. Qandê coy, destpakerdişê MED TV'î çiyêdo goreyê de-medê teknîkî yo û vera asîmîlasyonî 386 kanalê Tirkîya ya dezgeyêdo ca dir o. Bol bi tesîrbiyayîşê ya zî tayn tesîrbiyayîşê ci girêdayeyê meharete bîkarardişê Kurdan o.

Tabî ki zey heme milletandê bînan, Kurdan miyan di zî babet babet fikrî estê û do bibê zî. Meselada Telewizyonî ser o zî fikrê ciyay ciyay estê; labirê bolkiya Kurdê ki fikrê ci yo siyasî ciya yo zî, ê ki fikrê ci zey pê ya yo zî meselada MED TV'î di kêfê eynano yeno. Feqet tayn Kurdê "siyasi" zî estê ki, bi çiyên a qayil

nêbenê. Hetta tayn Kurdî, Kurdistanî bireynê zî û şîrê aşmî ser zî eynan çim di çiyê niyo. Çiki Kurdê winasîni bi hissandê xo ya winî biyê serxoşî ki, ê zî nêzanê ki ê yê xizmetê çîçî kenê. Kurdanê winasînan gerek kes vêşî goş pa nêno! Zeki pîlanê ma vatê, "wa xo rê weşî bê û qeçkandê xo miyan di bê."

Heme Kurdê welatheskerdixî, meselada Kurd û Kurdistanî di terefê. Ê terefê eynan zî, bê munaqêşe, kîştê Kurdandê welatheskerdixan o. Kes ganî (gerek) meselada MED TV'î ra zî wina biewiniyo. Helbet fikrê kesî yê siyasî û ciyay zî estê û fikrê kesî partî û grûbandê siyasîyan ser o zî estê. Feqet ciyay fikrîyayîş, kesî rê mazeret niyo ki çiyê ki kesî hewrandê şewan di zî bidîyayê û pa bawer nêkerdê, kes ewro bivîno û fina zî ze dişmen biewniyê ci ra.

Heta tiya min va, MED TV vera dişmenî silahêdo rind o û heqê her Kurdî / Kurdî esto ki ci ya paye bikero. Pekî ganî program û rayberdişê MED TV'y senî bo? Zeki min cor di zî va, destpakerdişê MED TV'î dima min bi xeylê Kurdan a qisey kerdî. Hema hema heme şar (xelk) û bol-kîya Kurdandê siyasîyan bi MED TV ya bol şa biyê. Ê zeriya min zî, zeriya ê heme Kurdê bînanê ki kêfê ci MED TV'î rê yeno zî wazena ki MED TV bîbo dezgeyêdo millî û demokratîk. Qandê ki bişo bîbo dezgeyêdo millî û bi heme awa ya bişo layiqê namedê MED TV'î bo, ganî Kurdê ki ci idare kenê û ê ki teberdê ci ya yê, bi awayêdo samîmî ya vera pê gamanê dostaneyan bierzê û bê şert pê rê ardim bikerê.

Tayn Kurdê ki ci dest ra kar yeno, ganî vêşî xori nêfikiriye û MED TV'î rê ardim bikerê. Ganî Kurdê winasîni bizanê ki karê orte di bo, tayn do ê karî bikerê. Ê ki heqdê ci ra yeno nêkerê, ê bîni do bikerê. Wexto ki netîceyê ê karî nebaş bo, gunayê ci tenya ê kesandê ki o kar kerdo niyo, ê kesandê ki şenê û nîkenê yo zî!...

Tabî MED TV hewna newe yo û o yo hewna programê tesî (ce-ribnayışî) vila keno. Dewleta Tirkîya wazena no televizyon bêro girotiş. Cayê buroyandê ci zî hewna weş belî niyo. Tayn welatê Awrûpayê nêwazênê ca bidê ci. Qandê coy, ez nika nêwazena programê ki heta nika vila kerdê, ser o vindera û fikranê xo vaxa. Feqet bado ez do na kîştê mesela ser o zî vindera û fikranê xo vaxa.

Ez hêvî kena ki MED TV bi heme awadê xo ya bîbo dezgeyêdo millî û demokratîk ki bişo bîbo çim û goşê Kurdan. Elbet TV ronayîş rihata niyo. Ki şima min ra pers kerê, Kurdan rê TV ronayîşira dewletî ronayîşî zî zehmetêrî yo. Bi na zehmetey a zî ez hêvî kena ki MEI TV, him bi programandê xo yê bi qalîte ya û him zî bi teknîkê xo ya vera dost û dişmenî ya Kurdan risipe vejo. Bi nê fikran û na baweriyêdo xo ya ez MED TV'î pîroz kena û kesê ki no TV ronayîş wa bexudar bê ki ma û qeçkê ma kerdî wahêrê dezgeyêdo wina. 14.4.1995

Ferhengê Kirdkî-Pehlewî-Kurmanckî-vî

■ Malmisanij

Kirdkî (Zazakî)

ditene, dutiş
est biyayîş, estiş

estewrine, astorini; nêzaya
esto/esta
estor/estori; bargîr, bergîr
estune
eşkera, eşkera
eşkarayey, roşn vînayîş
eşkawitiş, aşkawnayîş
eşkence, eskince, işkence
eşnawitiş, hesnayîş
eşnawitene, hesnayêne (bieş-
nawe/ bihesne)
eşnawitox
ey!
-ey, -î, -iye (poşmaney, poş-
manî, posmanîye)
ez

Ê

-ê, -î
-ê, -î (lacekê, rojî)
-ên, -în (zerrên)
-êr (weşêr)
êre, yere

F

Ferat
ferman
feylezof, filozof
fin, ray, rey
fil
fiynayîş/finayîş, estene, eştîş

G

ga
gale (galey heqbî); cuwal
game, gamî; pa
gamêş
gan, can, cûn
ganawir, cenawer, cinawir
ganî
gaydayêne, gaydayîş
gaz kerdiş
ge
gede
ge ge, zeman zeman
gel
gend (gend û gemari)
genim, xele
gerd, toz
gerre
gerre kerdiş
gerrekerdix
germ
germî, germey
germo, hemam

Pehlewî (1)

dûştînen, doxten, dûxten (2)
estîten, bûten, zîvasten; estîşn, es-
tişnîh, hestîşn, hestekîh, estekîh
sterven, azaten
hest, estêt
stor, esb; barek
stûn
aşkarek
aşkarekîh, aşkarîh, roşn vênakîh
şkeften
şkencek, şkênçek
aşnevişn, şnevişn
şneften, eşnûften, aşnûten, oşnûten
(eşnaw)
aşnevax
ey!
-îh (peşamanîh)

ez

Ê

-î
-ê
-ên
-ter
êvarek, êvarekgas

F

Frat
freman
filosofa
vîn, rîn, caver
pîl
efgenten

G

gaw, go
gewal, cuwal
gam; pad, pay, pey, pai
gavmêş
gyan, gan, can
canever, gyanwer
gyanwer, janver, canîh
gaten
gezîten, gejîten
gah
kevatek, kutek
zemanek zeman
gal (3)
gend
gendom
gerd, toz
gerzişn, gilek
gerzîten, girzîten
gerzîter
germ
germîh
germapek

Kurmanckî

dotin, duwîtin, dwîtin, doşîn
hebûn

stewr
heye
hesp; bargîr, bergîr
stûn
eşkera
eşkereyî, aşkarî
bişkavtin
şkence, eşkence, işkence
bihîstin, pê hesiyan
bihîstin (bibihîse)

yê ku dibihîse
ey!
-î (poşmanî, poşmanî)

ez

Ê

-ê
-ek (lawikek, rojek)
-în (zêrîn)
-tir (xweştir)
'esr, berî êvarê

F

Ferat
ferman
feylezof, filozof
car
fil
avêtin, avîştin

G

ga
çewal
gav, pê
gamêş
can, giyan
cenawir, cinawir
giyandar, bican, jîndar
gan, gayîn, gadan
gezîtin, gez kirin
geh, ge
gede
geh geh, zeman zeman
gel
genî
genim
toz
gilî
gilî kirin
kesê ku gilî dîke
germ
germî, germahî
germav, hemam

(1) Kelîmeyê Pehlewîyê ki tiya di nusiyayê, mi nê kitabî ra vîjnay: Dr. Behram Frewşî, Ferhengê Pehlewî
(2) Hûmara 156. a Armançî di herinda kelîmeyanê Pehlewî "dûştînen, doxten, dûxten" di, ebi şaşey "dotin, duwîtin, dwîtin, doşîn" nusiyayî.
(3) Pehlewî di "gal" yeno me'na "karkerê mulkê şahî û girdan, grûp".

Zono Resmî...

verniya ci riperrê 16. de

Tirkê ke welatanê xêrîvan der ê, dewleta Tirkî sava dîne eve zonê Tirkî programanê radyo û televizyonî wazena; sava domananê Tirkî ki mekteban de ancîya (oncîya) dursa Tirkî wazena. Waxto ke na çîyanê nîyanênan wazena kî qe zono resmî nêana (nîyana) aqilê xo. Çi ke esto, ne Tirkîya de wendişê zonanê xaman, ne kî welatanê xêrîvan de Tirkî de wendiş, ziddê zonê resmî niyo. Na mesele, têyna eke Kurdî ser o ame qeşeykerdene yeno werte. Eve na vatanê nîya

puçû kî Kurdî yeno yasaqkerdene.

Eskera wo ke, heqa Kurdî de sîyaseto xiravo ke dewlete rama-na, elaqê dêy û "zonê resmî" çîno. Hedefo ke kolonyalistê Tirkîyan eve na vatene wazênê ke biyarê hurêndî na wo: Ê wazênê ke eve na raye, politîkaya xo ya rasîsta ke serra 1924 ve nika yêna, aye û dismenayêna gelê Kurdî ya bêhudude çiman ver ra durî fiyêne. Uzay ser o kî, zê meselanê bînan, na noxta de kî zurî kenê. Asîmîle kerdena gelê Kurdî û werte ra wedardena zon û kulturê Kurdan hedefê dînewo esas

o. Wexto ke qediyayîşê serra şîyayîye de Demîrelî kombiyayîşê (civîn) pressî de qe-sey kerd û cuwavê persê da, kerd eskera ke yê parçebiyayîşê dewlete ra tersenê, uzay ser o eve Kurdî televizyonan rê musade nêkenê. Bêguman na vatene ve xo dana eskerekerdene ke sîndorê dewleta Tirkîya eve neqîye û zor-bazênî amê werte. Eke zonê miletê ra programê televizyonî kî benê sebebê parçebiyayîşê dewletê, ma sîndoranê a dewlete ra zêde sist, dîne ra zêde tirrevirre çî esto?

Zono resmî û eve Kurdî wendiş

Mûnzûr ÇEM

Çi waxt ke Kurdî û na zon (ziwan) de wendene ser o bêro qesêykerdene, kolonyalistî dest nanê pi ra, zu fek ra vanê "zono resmî" û çiyêde bîn nêvanê. "Zonê dewlete wo resmî Tirkî yo, wendişki gereke eve (ebe, ebi) Tirkî bone" ya kî "Ê zu dewlete, zu zonê xo yo resmî beno" û tayê vatenê nîyanênê bînî rew rew ênê gosê mordemî.

Gorê fikrê mi, mordemo ke na meselî ser o vindone, gereke her çî ra ravêr, cuwabê na persî bidone: Kurdî çinay ser o mecbur ê ke Tirkîya de eve Tirkî, İran de eve Farskî, Iraq û Suriya de kî eve Erebkî (Erevkî) biwanênê? Kurdîstan de wendişu nusnayışçi ra zono ke gelê (xelkê) ma maya xo ra miseno ebe dêy (êy) nî yo, na zonanê xaman ra wo? Na heqa esas a ke miletê dînya pêro wayîrê ci yê, miletê ma rê yaşaqbiyayêna daye çiyêda rast a? Bêgûman raste nîya û juyo ke zêzuvinên û heqa mordemî rê hurmetê xo esto, bese nêkeno ke vatena nîyanênê rê wayîr vêjyone.

Tayê estê, sava paraznayêna na neqîye, resmîbiyayîşê Tirkî, Erebkî û Farskî anê werte, nişan danê. Yanê ke na zonî, zonê resmî yê, uzay ser o Kurdîstan de wendişdîne (inan) ra wo. Rind o, delal o; ma na dewletî ve xo, resmîbiyayîşê na zonan emrê Heqî yo, çik o? Gelê (xelkê) Kurd, eve hezaran serr a ke na hardê xo ser o wo. Kurdî, zonanê dînya yê kanan ra ju yo. Hardo ke o te de wisto (usto) ra û bîyo kewe, o hard, cawo ke zê dergusa medeniyetonê kanan yêno hesabbiyayêne, o ca der o. Kurdî ve xo kî saz kerdişê na medeniyetanê kanan de wayîrê xêlê bare yê. Uza ra kî ravêrîme, her hetê hêyafî de, eve serbestîye zonê xo qesêy kerdişu nusnayışî rê, şert nîyo ke na çiyê nîyanênî bibêne kî.

Dustê naye de, sîndorê ke Kurdîstan parçe kerdo, 70 serre ra avê amê werte. Hem kî hurêamayîşêde (peyman, anlaşma) de emperyalist û kolonyalistî ra gore. Yanê, amrê na dewletan bibo bibo, handê amrê mordemê yo. Heto bîn ra kî, Peymana Lozanî de, qe hukimê çino ke Tirkî xo rê bikerê sevev û pê zon û kulturê Kurdan yasaq kerêne. Na heto zu de vîndo, delegasyonê Tirkan, sirê Konferansê Lozanî de, birayîya Kurd û Tirkî ser o qesêy kerd, garantî da ke na hurdemêna miletî, zêzuvinî bê, wayîrê êynî heqan bê û piya hêyatê xo devam bikerêne. Mada 39'ine ya Peymana Lozanî kî, sava wetendaşonê Tirkîya heqanê zon û kulturî cêna binê hukimî. Tirkîya hukimê na mada nîyana hurêndî, o çiyêde bîno.

Heto bîn ra kî çî turî beno bibo, eve çî hal ênê îmzakerdene bêrê, kes bese nêkeno ke peymanan (hurêamayîşan) bikero sevev û eve dîne heqanê mordemîye bicêro binê linganê xo, bipelexno. Eke tayê peymanî bibêne sebebê çiyê nîyanênî kî, lazim o ke yê peymanî werte ra bêrê wedardene; heq û azadîye nê. Eke mordem dustê na rastîye vêjyone, yêno o mane ke, zorbazên û neqîye çiyêda rast a. O waxt, wertê miletan de, "zorê kamî ke şî kamî" beno tore. Mordemî ke na ûsul ra herket kerd, bese keno heqe bido her û zorbazênî têdîne, inan rast bivênone.

Hama na kî esta ke, eve kamecî reng benê bibê, nayê ke wayîrê îdeolojîyê Kemalîzm ê, gereke mordem baver mekero ke yê bese kenê na het ra rayêda raste nanê ro xo ver. Eke inan na bese bikerdêne, watenê rast ê ke Kurdî wazenê, inan ser o zê malikî nahet-dohetî ser çivî nêdêne, zorbazênî xo rê nêkerde ûsul. Eke hen bibiyêne, honde dez û tenge nêamêne werte, problem rehet hal biyêne.

Heto bîn ra, "Ê her dewlete zu zonê xo yo resmî beno", na vatene kî raste nîya. Qe te de şik çino ke yê dewletê, juyî ra zêde zonê xo yê resmî beno ke bibêne. Eke şaş(sas) nîno ra mi vîrî, yê Hindîstanî des û çar zonê xo yê resmî estê. Dewleta Swîsra de Almankî, Fransîzkî û İtalyankî her het ra zê zuvinî yê. Ê Belçîka kî tîpîya di zonê xo yê resmî estê. Mordem bese keno ke mîsala zêde kero. No kî yêno o mane ke, çiyêde zor nîyo ke dewleta Tirkîya bibo wayîrê di zonan. Wendiş, didî ya kî didîne ra zêde zonan de mumkun o. Vajîme ke, eke Kurdîstan de wendişêve Kurdî bo, Tirkî ya zê dersêda mecbure bêro wendene ya kî serbest bo, kamî ke wast va biwano; Tirkîya de kî tam ziddê nêyî bibo, yanî wendişêve Tirkî bo, Kurdî kî zê derse bêro wendene, çî te de esto? Eke nayê ke wayîrê tezê resmî yê, inan (dîne) dest ra biyamêne, axuyê Kemalîzmî ra xo bixelesnêne ra, hevîkê senkek bo kî mantiq ra fikir bikerdêne, ci rê zahmet nêbî ke îne kî bidîyêne ke na ûsul sava hurdî miletan, ûsulêde xiravin nîyo. Hama kotî ra dîne de na fikir?

Na mesele de, çiyêde bîno ke îcav keno ke mordem ser o vindone kî na wo: zono resmî, eve zonanê bînan mektevan de wendişî rê engeli nîyo. Ya kî engel nîyo ke mordem eve dîne radyo û televîzyonan saz kero û pê çî çap kerone. Eke mordem eve şêkilêde bîn vazo, zono ke resmî nîyo, eve dêyî (êyî) mektevan de wendişya kî kitab û roznameyî (qezeteyî) çap kerdiş, biyayîşê zonê resmî rê engel nîyo. Xo ra rastîya dîna kî ewro na wa. Zono resmî çî beno bibo, her dewlete mektebanê xo de zonanê xaman dana wendene. Tirkîya ve xo kî hen kena. Hata mordem bese keno vazo ke, Tirkîya de mektebê henênî estê ke Tirkî te de zonê didîne wo. Radyo û televîzyonanê Tirkîya de, çeşit çeşit zonan ra programî estê.

dewamê ci riperê 15'in di



Konferansê Ehmedê Xaniyê ra demê Foto: N. Bal

Konferansê Ahmedê Xaniyê

27ê Gulane di, Stockholm di konferansê 300 serreya nûsiyayîşê Mem û Zîn a Ehmedê Xaniyê viraziya. Federasyona Komeleyanê Kurdîstanî Swêd di û Komeleya Nuştexanê Kurdan Swêd di piya no konferans viraşt. Dr. Martîn Van Bruinessen, Prof. Joyce Blau û

Mûrad Ciwan ze qisekerdoxî hazir biy. No semîner di nezdiyê disey goşdaritoxî biy. Serokê Merkezê Kulturî yê Kurdî yê Moskova Prof. Şakîrê Miho û Dr. Beşîr Resûl jî ze meyman no semîner di hazir biy. Qisekerdoxan dima goşdaritoxan persê xwi inan ra

kerdî û inan jî cewabê persan day. Zek yeno zanayîş M. Emîn Bozarslanî mektûbê riştîbî UNESCO'yê rê û waştbi ki serra 1995 bibo serra Ehmedê Xani. Labelê na niyamê qebulkerdiş. Ehmedê Xani kitabê xwi yo bi namedê Mem û Zînî 300 serrîra ver nûşt bi.

Kongreyê Federasyonî

FKKS'î (Federasyona Komeleyanê Kurdîstanî Swêd di) kongreyê xwi yê 14. 21-22'yê Gulane di salonda ABF di viraşt. Kongre di kar û girweyê Federasyone yê di serran amey munaqeskerdiş û kemaneyan ser o ame vinderdiş. Delegeyê ki çewres komeleyan ra ameybî fikr û pêşniyarê xwi vatî û kemaneyan ser o rexneyê xwi vatî. Roja didine komîteyê newey amey weçînayîş (vîjnayîş).

Komîtey newî di her çehar parçeyandê Kurdîstanî ra Kurdî estê. FKKS, Swêd di Kurdan temsîl kena û di serran ra finê kongreyê ci viraziyo. Emser 209 delegan ra 118 delegey kongre di hazir biy. Xeylê meymanî zey; Prof. Şakîrê Miho, Dr. Beşîr Resûl, Ezîz Muhemmed, Wîcdan Baykara û temsîlkarê partiyanê Kurdan jî kongre di hazir biy.



Parlamentoyê Kurdistanê İraqî Hewlêr di

Foto: Armanac

Parlamentoyê Kurdistanê Başûrî kom bi

Parlamentoyê Kurdistanê Başûrî 27ê Gulane di, dewda Daraban di ki nezdiyê Hewlêrî ya, kom bi û no kombiyayîş di qerar girot ki weçînayîşê (seçimê) parlamentoy o ki ganî 4ê Hezîrane di bikerê, 4ê Hezîrane serra 1996 di bikerê. Gorey xeberanê ki wija ra yenê her di partiyan yanî PDK û

YNK'ey na mesela ser o pê kerdo. Yeno vatiş ki na kombiyayîşine 15 deqey ramito û 85 mebûsan rayê xwi qandê nê qerarî rê dayê. Zek yeno zanayîş qandê ki nê her di partî lecê pê kenê, parlamento nêşeno karê bikero û heme kar û girweyê Hukmatê Kurdîstanî vinderdo.

MED TV Pîroz bo !

riper 15